- التوقف عن أية إصدارات نقدية جديدة تساهم في زيادة المعروض من الكتلة النقدية بدون تغطية إنتاجية أو قطع أجنبي لأنها تؤدي إلى تراجع في القوة الشرائية للنقد وارتفاعاً في معدلات التضخم.

وعلاوة ما ذكر من الإجراءات الاقتصادية وغيرها لا بد من العمل على إيجاد حل سياسيّ للأزمة التي تعيشها سوريا منذ أكثر من أربع سنوات ونصف تسببت خلالها المواجهات المسلحة بجر البلاد واقتصادها إلى حافة الهاوية. ودفعت بنسبة عالية من السكان إلى النزوح ومغادرة البلاد. لأنه (حتى لو لم نرَ أي ضوء في نهاية النفق يجب استمرار الاعتقاد بوجود ضوء ما وبقرب ظهوره).

أكاديمي متخصص في اقتصاديات الطاقة والنفط

buyer PRESS
الخبر ... بكل شفافية
www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545

المهاجر

سليم ابو اراس

1
كل الوسائد التي صنعتها امي
من ريش الدجاج
والحمام
ما تحملت اوجاع راسي!
2
ثلاث و خمسون طلقة
منذ الولادة الاولى
ما اخترقت جدار الصمت
3
طلبت الحبيبة بطاقته
الشخصية
فبكى طويلاً
4
كتب المهاجر لوطنه
احبك
قال الوطن:
تعال اذن
5
عندما مـات والده
قرأ الفاتحة
عندما ماتت امه
قرأ الفاتحه
لكنه بكى طويلاً
عندما شاهد على خاصره الوطن
شريطاً اسود
6
في الليل انتظر النهار
ليعبر النهر الى الوطن
و قبل ان يأتي النهار
كان النهر مذبوحاً
و الوطن في قبضه المهربين
يصرخ
7
في النهار انتظر الليل
ليلتقي وطنه
و قبل ان يأتي الليل
كان السجان ينظم
استمارة الوطن .

روزا

ليلى يونس

من بين فخديّ يتساقط ورد قبلك
أكدّس الرمان و أوجاع القصب في فم حبيبي
كي نأخذ الموت بخفّة أكبر
و نُطلّ من الهاوية مبتسمَين يدي في يدك
حين أغلق و أفتح أزرار قميصك
ممتلئة بك حتى الرحم
مائلة كجذع أثقله ثمره
جسدي يغني - يتصلّب - يرتخي - يموت
ألحس عينيك من بُكائهما .. و عذابات الأمس
"روزا" قبضة الوردة من خصرها
و رمال تتصلّب - أنثى
أُسيّر الوهج منك -إليك
ترسم شفاه امرأة ملقاة على فخديك.
كحلم بعيد نطبخ المسافة
لم أُخلق من ضلعك .. أنا خُلقت من ظفر
اصبعك الذي نسيته داخلي
من تلك الدمعة التي شربتها من عينيك و وضعت بدلها نجمة
ولدت من قصائدك و شهقة الحنين

أعود لأحدثك عنها - عنهن - عنه - عنهم
كي نبقى جالسين وسط الزحام .

قصة قصيرة، كائن يشبه الصرصور

ماجد سُخاني

الساعة الان العاشرة واثنتا عشر دقيقة تماماً ، جاء دوره من حصة الكهرباء منذ اثنتا عشر دقيقة ، نفض سيكارته انتبه لصرصور أسود قاتم لا يشبه الصراصير العادية والتي هي بلون البني في كاسه الفارغ ، تمعن به جيداً وسأل ذاته ايعقل أن يكون هذه الصراصير الغير عادية هم جواسيس أو تحمل أجهزة تنصت بداخلها / التكنولوجيا أضحت مفزعة / بحجم فزعه وقرفه ...فمنذ ظهور هذه الحشرات وتنقل أخباره الشخصية بدقة لجهات عدة. ..؟

ارتشف من فنجان القهوة الباردة بعد أن تفقدها بدقة. .وتذكر ذاك الشخص عند لقاءه في وسط السوق سائلا :

- أوه.. أراك هنا يا صاح وقد سمعنا بانك خارج البلد ، طالبا اللجوء لأمريكا. .

- أمريكا - فرد سحبة- ..ياصديقي. .من أين لك بهذه المعلومة ..ومن أين لي بالمال ..

- عمك أبو حسين رح يجهزلك كل شيء.

- اه..يعني أصبحت عميلا بآخر عمري ولا ادري. .

بعد يوم من الحديث معه اتصل به جهة معينة .. و أثناء التحقيق :

-نعلم بكل تحركاتك و اتصالاتك ..كنت البارحة في المطبخ تساعد زوجتك وانت بالذات حملت السفرة عوضا عنها ، وقلت لها مساعدتي لك ليست دون مقابل. .أليس كذلك. .؟.

- وما الضير في ذلك ثم لم يكن أحدا في المطبخ سوانا ولا يوجد فيها أجهزة مراقبة أو كاميرة سوى بعض الصراصير حول مصفاة المياه. .

- ابتسم المحقق لدى سماع كلمة الصراصير ، وقال:

- نعلم بكل شاردة و واردة ..وقبل أن يأمره بالانصراف رفع سبابته محذراً إياه لو تفوه بكلمة أو تجاوز الخطوط الحمراء. بعد مدة اتصل معه جهة أخرى و بأسلوب مخابراتي بحت ذكره بأيام ماضية ، وضع كلتا يديه على المنضدة ونظر بازدراء صوبه وقال بلهجة التهديد :

-اسمع ما أقوله لك ، انت تعمل ضدنا وتقف مع جهة أخرى وتلك الجهة هي من المحور المعادي لخطنا. .

- لست مع أحد ياسيدي ولا اعمل مع أحد لو تدري بوضع الصحي لما اتهمتني بذلك فأنا معي مرض الإسهال ولا ابارح التواليت ..

- احترم المكان الذي انت موجود فيه ، وليكن بعلمك نعرف ذلك ونعرف باليوم كم مرة تدخل المرحاض.

- قالها: - باستهزاء - وحتى هذه تعرفونها. .

- نعلم بكل حركة وكل صوت يخرج منك ، قبل أن يجلبك دوريتنا بقليل كنت بالحمام أليس كذلك. .؟.

- هز رأسه بالإيجاب. .

- صدر من مؤخرتك أربعة أصوات طويلة واثنان دراكا كالرشاش الكلاشنكوف. ..

- تدرج لون سحنته إلى الصفرة وطأطأ رأسه خجلا. .

ساساعدك بالخروج من هنا هذه المرة وفي حال تكرار الأمر اعذر من انذر. سناخذ الإجراءات اللازمة بحقك وانا واثق بأنك تعلم ما هو إجراءاتنا. .سنفقا عينيك. .انقلع.

أثناء خروجه مصدوما من لهجة المسؤول ..بدأ يفكر مليا أثناء الطريق ..معقول الحمام ..والله كنت لوحدي. .وإذ بدراجة نارية خلفه تئن من السرعة يترجلها صرصوران وما أن أصبحا أمامه كانت طلقة صادرة على نافوخه ، ذهل جامدا ولم يسقط أو يخر كجثة ، تفقد ذاته لمس رأسه ثم رقبته فاذنه ..لاحظ بشيء لزج وحار ينزل ..حاول الوصول إلى المنزل ويده على أذنه. .

وبعد الواحدة من منتصف الليل كان له نصيب مع مكالمة من جهة اخرى ..أمره المهاتف بوجوب الحضورك حالا..

- يا جماعة ..في هذا الوقت المتأخر ..لا أحد يخرج من بيته أيام الخروج والتجوال أصبحت في خبر كان.

- أن لم تحضر سيكون مصيرك في خبر كان ، طلقة طائشة و رخيصة لأنك لا تستحق أن نجعلك بطلا. . ننتظرك الآن. ...وأغلق الخط.

-ماذا أفعل يا إمرأة ..

- ارتدي معطفك وخذ مسدسك معك ...

-وهل تريدين ان تتخلصي من هذه القطعة التي خبئتها للأيام الحالكة ..سيصادرونها بكل تأكيد. .

- وهل هناك احلك من هكذا وضع ..إذن خذ معك عصى ، الكلاب الضالة ممتلئة بالشوارع. .

أمام باب المحرس فتشوه ، وتقدمه أحد الحراس ليوصلوه لمكتب معلمهم. .طرق الباب ودخل:

- ايفار باش هفال / رفيق. .؟.

- لم يرد ، بل أخرج ولاعته واشعل سيكارة ثم بعد نفثين وتصاعد الدخان في وجه المطلوب نظرا مليا وقال :

- اولا لست رفيقك ولا يشرفني ذلك ..ثانيا وهذا الاهم ، ماذا همست بإذن زوجتك. .؟.

- عفواً. .هذه خصوصياتي والبيوت لها حرمتها ..

- أي خصوصية يا حشرة ..لقد شتمتنا أثناء اقترابك من زوجتك على السرير. .وهمست لها ..لولا هؤلاء لكنا بالف خير ومرتاحين نفسيا. .؟.

انت يا حشرة لست مرتاح من وجودنا. .

- هفال ..والله لم أقل ذلك هذه تهمة توجهها لي لاني رفضت الزواج من قريبتكم. .

-اخرس والا ساقطع لسانك. .قميص نوم المدام لونه اصفر أليس كذلك .و لون مخدتك أحمر. .والاغطية لونها قرميدية. .

هل تريد أن أخبرك أيضاً بوضعيتكما أثناء ...../. .

أخرج من هنا وهذا آخر إنذار لك ...أفهمت. ؟.

- حسنا ..حسناً ، لكن احلف بدماء الشهداء لم اقصدكم ..ولا أقصد شخصكم. .

عاد وفي رأسه طاحونة تدور وتجرش الأسئلة. .

قبل أن يفتح باب منزله تذكر أن صرصورا قاتما كان على معطفه. .؟.

حضنته زوجته برجوعه سالماً و ذهبت لتحضير كأس من الزهورات لتهدئة أعصابه. .

ما أن رجعت من المطبخ حتى شاهدت مجزرة بحق الصراصير. .

وهو يهذي ويقول : هؤلاء جواسيس ومخبرين العصر ..

- ماذا دهاك لقد وسخت الغرفة .كان باستطاعتك غدا جلب مستحضر مضاد للحشرات. .

- لو تركتهم دقيقة واحدة لوصل أمرنا لجهة رابعة، هؤلاء من صنع امريكا امريكا. .؟.

سأحكي للإله

عدنان الاحمد

لم أمت .....
أنا ماض فقط الى الإله ، حاملاً في
جعبتي جميع رسائلكم
معناتكم ، مأساتكم ، مطالبكم .....
سأحكي للإله كل شيء ،
لن أخاف بعد الآن .
ولن أنتظر دوري في طابور الأطفال
الغارقين ،
لقد مللت الانتظار .
إن الإله سيعرفني من كنزتي الحمراء
و حذائي ، ومن اللون الأزرق على
شفتي ،
لا تقلقوا -
لن انتظر في طابور الأطفال الغارقين
قبلي ،
إن رائحة البحر سيصل أليه قبلي ،
سأحكي له عن مأساة شعب كامل
عن تدمير مدن بأكملها
عن تشريد وتهجير وطن
ولن ابكي أمامه فأنا لست النوع الباكي
من الأطفال
ولن اصرخ أمامه فأنا لست اللا
أخلاقي
سأقول له ....يا سيدي الإله
مدينتي ليست" رقعة "
ونحن لسنا البيادق ولسنا النرد
المصنوع من البلاستيك او الحجر او
المعدن ،
بل نحن أرواح تلطخنا بالرمل والدماء
....
يا سيدي الإله فليكن أنا الطفل الغارق
الأخير في بحرك .
نعم !!
سأقول له ايضآ ،
الملكان المكلفان بحراستي
قد خذلوني يا سيدي
ألتهمني البحر ولم يساعداني
أبدآ.....
بعد أن تعرضت للإغواء.....
أغوتني الألمانية بإنسانيتها
كما أغوى الشيطان آدم بتفاحة
يا سيدي الإله أنا مثلك الآن ،
يتاجر المنافقون بإسمي
أنا الماضي وأنا الآتي
أنا الذي جدي لم يحمي أبي
وورث أبي ما فعله جدي
أنا الملاك الكوردي
أنا آلان ذاكرة البحر.

آرين

زاهد محمود

مرحى لعشقك
فقد كان جامحا
أبا....الا يرتوي
الا من التراب
مرحى لشوقك
وقد فاض....
حاملا ذراعيك
يهدي الى الشمس
قصائد دجلة
اطيافا ما عرفت
الا تلاوين الحب
ومرحى لعزك
ادام العز ....
في عيوني وطني
ومرحى للفرح
فقد كنت خير توأم
ومرحى لك
وانا اتأمل جبينك
اقرأ العلياء
اقرأ العزم
اقرأ الاصرار
وهو يصفع الغدر
في المهدي
مرحى لك
و ما كنت
الا لبوة ربطت
على خاصرتها
امانة الكرد

اعتياد

رنا ناصر

زحمة الأرصفة و الشوارع أصابت رأسه بدوار .
أبواق السيارات المتصاعدة و صوت بائعي البسطات كطبول تطرق أذنيه .
الغبار خانق و حرارة الشمس ترتفع كلما تقدم العمر بالصباح .
دون جدوى ، وضع كلتا كفيه على عينيه ، علّه يستر عنهما انعكاس البهير .
هرع الى البيت مهرولاً ، خفقات قلبه تسبقه ، تنبىء عن أساه .
أحكم إغلاق كل الستائر ، ألقى بجسده على أرض عزلاء ، سرت برودتها الى قلبه ، خففت بضعاً من حنينه لغرفةٍ صادقها عشرين عاماً في ؛معتقل .

وطني

إيمان السيد

قال لي :
كيف أفرح بحزنك ؟
وكيف أغدو إلاك .!!
وأنت دمعي حين أبكي ولحني حين أغنّي
وخطوي هداك ....!
وبك يسترشد عكازي الكفيف إذا
صداتُ بوصلة مساري ...!
متلازمان أنا وأنت كتوأمين سياميين
..إذا فُصلا مات بعضك في كلّي
وانحسر ظلّك وراء شمسي .!

وحشة

أنا في كل مكان.. ولكل مكان

زاوية يكتبها

طه خليل

يجب أن أكون في كل مكان، في كل مهرجان، وأكون رئيسا لاتحاد الكتاب الكرد، واتحاد الصحفيين، واتحاد السينمائيين، واتحاد الحقوقيين، واتحاد التشكيليين، وأكون رئيسا فخريا لمنظمة البيئة، ومديرا بالوكالة لعمال العتالة، وقائدا للأوركسترا الوطنية، ورئيسا للجنة توزيع الجوائز الشعرية الأسبوعية والشهرية، ورئيسا لتحرير أية جريدة أو مجلة تصدر في كردستان أو كوردستان، شيوعيا مع الشيوعيين، وأخا مع الاخوان المسلمين، قوميا لايشق لي بطن وأمميا أعطي دروسا عن تجربتي في بناء الأممية الثالثة وأطبع كراريس أضمنها حواراتي في كومنترن موسكو، أبرق لذوي القتلى من طرفين متحاربين وأنعت لكل طرف قتلاه بالشهداء والخصوم بالمارقين والغوغاء، عربيا مع العروبيين وقطريا مع اللبنانيين، خليجيا ألبس الدشداشة وأقبل يد الشيخ، وإن لزم الأمر ألمس طرف كعب رجله بأنفي، وكلما « مات « رجلا مشهورا، اكتب عنه قائلا: كنا معا قبل ساعات من رحيله، وأوصاني خيرا بزوجته وأولاده، وبناته، وكلما ظهر كاتب أو شاعر كوردي أو كردي، كتبت أنه كان من تلامذتي، وما أخط حرفا إلا لأظهر أنني مظلوم والكل يحسدني ويكرهني ويحيك لي الدسائس، وأنا قادر على فضحهم، لكنني لا أفعل ذلك ترفعا، كل النساء هن حبيباتي، وكل الشعراء الذين أحبوا، كانت حبيباتهم عاشقاتي وعشيقاتي، وقد مللت منهن.

أنا قائد في الجيش الحر، وأمير نكاح في داعش، وقائد ميداني في وحدات حماية الشعب، ومقدم في جيش النظام، وقائد لواء في كتائب القونرش، أنا من أشعل ثورة السابع عشر من آذار في سوريا، وانا من أبرق لبوعزيزي ليحرق نفسه كي يدخل التاريخ، لقد ظل البوعزيزي ليلتها معي على السكايب حتى شقشق الفجر، وأعدت أمه عربته، وعندها ودعني وهو يقول لي : « انت من سيدخلني التاريخ « وهذا ما حصل بالفعل.

آخر اتصال وجدوه على تلفون القذافي كان من رقم موبايلي السيرياتيل، وقد استجوبتني المخابرات الامريكية حين اكتشفوا رقمي في « موبايل « معمر.. يومها سألني الأخ القائد وكنا نتشاور كثيرا من قبل، وقال : « ما رأيك هل الأمريكان جادون في القبض علي .؟» فنصحته أن يغادر ليبيا، وبعد حين يمكن العودة عن طريق تشكيل حزب ديمقراطي، وقد استجاب لنصيحتي وقال لي وهو يتنهد بعمق :» لابأس.. سأعمل بنصيحتك واعتبارا من الغد»، ولكن الامريكان التقطوا اتصالنا فقصفوا موكبه في اليوم التالي وهو في الطريق للمغادرة، أما فيما يتعلق بحسني مبارك فبالطبع عمل بنصيحتي حين قلت له إن أوباما جاد فيما قاله، ولهذا تنحى، أنا من وضع أسس الإدارة الذاتية الديمقراطية في روجافايي كردستان، تماما كما كان والدي مفكر أو ملهما لثورة أيلول في جنوب كردستان، وثمة معلومة تاريخية اصححها لشعبنا تتعلق بثورة الشيخ سعيد، فالشيخ سعيد كان جنديا عند جدي الذي أشعل الثورة لكنه غدر بجدي ونسب الثورة لنفسه، وبعدها هرب جدي إلى روجهلات و وضع أسس جمهورية مهاباد لقاضي محمد، ورفض أن يستلم أي منصب في الجمهورية، وجاء الى روجافا ليؤسس مع بكداش نواة الحزب الشيوعيّ السوري وحين انحرف بكداش، تركه واستعد ليؤسس أول حزب كردي وهذا ما حصل فجدي هو من أسس البارتي، ولكن رفاقه غدروا به، ونسبوا كل شيء لأنفسهم، وتركوه في سجن القلعة، حتى تدخل يومها « خراتشوف « وأطلق سراحه، وكل من لا يعترف بفضل عائلتنا هو خائن وعميل.

اما بشأن الخلافات بين تف دم وأنكسي، فأرى أن تف دم معها كل الحق فيما تقوله وتفعله، لأن المرحلة حساسة وخطيرة، وتف دم هي الوحيدة التي تعمل لوحدة الصف الكردي، و رغم بعض مآخذي عليها، فإنني أرى كل من ينتقدها خائنا للقضية، أما فيما يتعلق بالمجلس الوطني الكردي فأرى انهم محقون وكل ما يقولونه صحيح وصحي ويخدم الشعب الكردي وهم من يعمل ليلا نهارا لوحدة الصف الكردي في الاعدادي والثانوي، رغم بعض مآخذي عليهم. وكل من يقف ضدهم هو خائن للقضية.. اما فيما.....!

مثل هذا المخلوق لا يعيش وحشة فحسب، بل يعيش « بارانويا « الخراب، وكل ثورات العالم ومصابيحه لا تنير عتمة تعفنت في روحه.

لا خلوة لنا
أكسر جرار الأفكار جرة جرة
شفتاك في ارتعاشهما في صمتهما لوحة فنية.

أزرق. أزرق كشهوتي
كجبل أتسلقه و أصل الشبق
كي تحمرّ البُور على جرحها
و لا يبكي جسدي إلا ليلا. وحيدا
أقف كنبع من شفاه .. بلا أسرار و لا معجزة
فقط كما أراد لي عشقي أن أكون
أكسر نفسي حجرا فحجرا
تأتي فتصيرني : أنثى من جديد
و امرأة تسبّح باسمك

أريد البقاء وحيدة - لأضم القصيدة
وحيدة بما يكفي لأشتهيك
وحيدة كي أشعر بانتمائي - لك .
"وحدك".
و لنرب في العدم الكلمات الجارحة
"وحدك"
كي أنسج من الغياب قميصا مليئا بالأزرار
أفتح و أغلق
أُعريك و أُلبسك
فألبَسك .. فيضمك ثوبي.
أريد موتا يليق بنا ..
هل تموت معي؟

Her Wê Rokê

Ferhad Içmo

Evê Cengê evî Şerrî
Yar û neyar riswakirin
Di bin nalên top û Tenga
Hezar hêvî bê deng mirin
Kevokên jar birîndarin
Geh li virin geh li wirin
Lê, ronakên paşerojê
Li ber çava venamirin

Her wê rokê ev ceng û kîn
Ji vir barke her wê here
Her wê rokê ken û şahî
Li şarê min bizîvire
Li vî warê zîz û xemgîn
Her wê rokê agir vemre
Di nav davên xewn û hêv'ya
Demek jandar dibihire

Her wê rokê dîrok bêje
Kan'yên xwînê tev li virbûn
Li bajarê jîn û vînê
Hinek berx bûn hinek gur bûn
Ji rondikên sazên girî
Roj tev berf bûn tev agir bûn
Bi omîda sal buhurîn
Xwezî "mûm û gul û pir bûn"

Evê cengê bi tîrên xwe
Rûmet nehişt ji bo merda
Mîrên cengê şoreş kirin
Gol û kan'ya êş û derda
Lê şoreşê gur û rovî
Tev derxistin ji paş perda
Her wê rokê bi dawî bê
Dastaneya qîrên Kurda

Her wê rokê gemiyên me
Bên semayê di nav pêla
Tenbûra dil wê şa bibe
Bi peymana kok û têla
Refên hêv'ya emê rakin
Ji newal û ji nehêla
Nû wê Qabîl li pey Habîl
Bike hawar ji çar hêla

Her wê rokê mîrên cengê
Di lellan de bên dadgehan
Wan herikand li kolana
Çemê xwîna bêguneha
Ta bi baxan zer û hişk bûn
Di bin simên sal û meha
Qîr û hawar êrîş dikin
Perestgehên çav û guha

Dema Tifing razên mirnê
Li kolana diweşîne
Pênûsa jar bi çar lepka
Ji meydanê xwe dikşîne
Xemxurên jîn û viyanê
Tev bê rês û bê teşîne
Bayê xwez'ya dilê sêwya
Li pey rêwya pirr dêşîne

Her wê rokê giya derê
Ji bin hîmê li newala
Mendal ji nû wê xwe bigrin
Bi çokanên pîr û kala
Dahola sar wê germ bibe
Bi dîlanên ebrû dala
Kevokên gewr wê bilûsin
Li ser serê darên ala

Her wê rokê şervanên me
Ji sengeran bên malên xwe
Nû wê bigrîn li ser xwînê
Ser xwêdana hevalên xwe
Wê xewnên xwe bilorînin
Li bin siya wan alên xwe
Gelek peyvan dê bugherin
Ta bi cejn û sersalên xwe

Her wê rokê darên kevnar
Bi kulîlka bixemilin
Şaxên zuha ji bo reha
Tevde êş û derd û kulin
Şerme ku hîn biharên me
Bê nêrgiz û lal û gulin
Li ser şopa pakrewana
Jîn û viyan hêv'yên dilin

Her wê rokê partiyên pîr
Bi kaş'wa li serê hevxin
Pîlanên reş ji bin cilkê
Ji bo milet emê derxin
Ev hezar sal li ser masa
Em bê nav û al û nerxin
Lê di rojên teng û tarî
Ji bo kêrê em tev berxin

Her wê rokê biryara me
Ji zindanê xwe derxîne
Wê dîwarên girtîgehan
Bi destê xwe birûxîne
Merşikên sor li pêşya me
Bi kulîlka wê raxîne
Hirmizê kal ji bo aş'tyê
Lavijê nû wê bixwîne

Qey'kên mirnê ez dijmêrim
Di nav pêlên êş û jana
Peyvên şermîn ez parsdikim
Ji birînên hozanvana
Piştî xewna azadiyê
Bûm revendê biyabana
Her wê rokê jîn bibare
Ji wan ewrên li ezmana

Her wê rokê revendên me
Bikin bêrya ax û avê
Na, ew tijar jibîr nakin
Gor û warên dê û bavê
Emê herin pêşwaz'ya wa
Bi peyalên ji lîlavê
Li pişt ciya ez dibînim
Girnijîna lêvên tavê

Her wê rokê ..... kole
Barkin .....şêrîn
Vê bê.....xemê
Pirtir ..... birîn
Kurd.....erzanî
Em ji .....qêrîn
Bi dev.....neyarin
Bazirganên ..... zêrîn

Her wê rokê roman bigrîn
Li ser werzên çîroka me
Wê bûyer tev xwe xûzbikin
Li ber bejna dîroka me
Va belav bû li cîhanê
Hilm û tovê hîroka me
Şev û êvar wê tev barkin
Ji ber ronya nûroka me

Li asoyan ez digerim
Li sitêra li elenda
Gumanên xwe ez dipêçim
Bi xetîr û mûm û finda
Du çavên xwe digerînim
Li wan dostên dûr û winda
Her wê rokê xuya bikin
Li meydanên şar û gunda

Her sibeha li ber derya
Pîr û kala ez dibînim
Efsaneyên bobelata
Di çavên wa ez dixwînim
Sal zuhane xwen bihane
Darên hêvya hîn diçînim
Ji bo çavên Qamişlokê
Rênivîsê ez dişkînim

Her wê rokê bihêwirin
Ax û oxên evîndara
Dîlbera dil wê vegere
Li şûnwarê civankara
wê kulîlk tev bilîlînin
Ji bo dêmên gulên dara
Şevbuhêrka emê dadin
Bi biharên peyv û zara

Her wê rokê helbestên me
Li ezmana bibin Quling
Li pêşberî sitemkara
Divê bibin Şêr û Piling
Di nav baxê dost û yara
Wê bimînin perwan û hing
Bi dirana emê deynin
Heger pûçbûn ev dest û ling

Her wê rokê peyala min
Bi meya dil serxweş bibe
Wê çirûska şemal min
Bi awza dêm geş bibe
Wê pirtûka xeyala min
Bi pênûsê kêfxweş bibe
Wê xweliya al'ala min
Bi xunavê bê hiş bibe

Yezdanê min ez westiyam
Qêrîna min bê vedenge
Li şopa xwe ne poşmanim
Zanim ku jîn şer û cenge
Sal dibhirin hêvî pirrin
Lê dilê min hîn lehenge
Bê omîd û kar û viyan
Jiyan gorek sar û tenge

Ezim Mîrê rist û qana
Liser sînga welatên xwe
Ezim dengê êş û jana
Windanakim xelatên xwe
Heta mirnê li civana
Ez bernadim kelatên xwe
Ji bo hêsrê perîşana
Sûndê dixum bi latên xwe

Her wê rokê heyv derkeve
Ji nav ewrên zivistana
Wê perwan û heng û bilbil
Bên serdana dilistana
Dergehê dil emê vekin
Ji bo rêw'yên şaristana
Gurzên dila emê deynin
Li ber kêlên gulistana

Da ku dayik rizgar bibe
Ji bin destê hov û hirça
Divê zanên miletê me
Bibin dengê her çar perça
Wek barana emê avdin
Dar û lemên bax û bexça
Her wê rokê ser av bibin
Dilpijokên nav û nûça

Her wê rokê heyv derkeve
Ji nav ewrên zivistana
Wê perwan û heng û bilbil
Bên serdana dilistana
Dergehê dil emê vekin
Ji bo rêw'yên şaristana
Gurzên dila emê deynin
Li ber kêlên gulistana

Her wê rokê hêsir vemrin
Di peyalên herdû çava
Wê bûka me bixemile
Li nav baxê dilê zava
Ti kes naghê mebesta xwe
Bi gezin û bi lavlava
Perdên şevê têne sotin
Bi çirûskên dengê tava

Her wê rokê perwanên me
Piştî tirsê bên semayê
Wê sawêrên xewnên lerzok
Herin li ber pêlên bayê
Bê baran û berf û teyrok
Li ti wara bihar nayê
Qet di rêça dûr û dirêj
Xwe ned destê tirs û tayê

Na, ne xewne li gasîna
Emê bêjin em azadin
Em dûjeha welatê xwe
Bi buhiştên xelkê nadin
Bi kerwanê cangoriyan
Agirê xwe emê dadin
Heger welat tev wêran bû
Goristana em bernadin

Her wê rokê heyv derkeve
Ji nav ewrên zivistana
Wê perwan û heng û bilbil
Bên serdana dilistana
Dergehê dil emê vekin
Ji bo rêw'yên şaristana
Gurzên dila emê deynin
Li ber kêlên gulistana

Her wê rokê helbestên me
Li ezmana bibin Quling
Li pêşberî sitemkara
Divê bibin Şêr û Piling
Di nav baxê dost û yara
Wê bimînin perwan û hing
Bi dirana emê deynin
Heger pûçbûn ev dest û ling

Her wê rokê hestiyên min
Bibin şîva gornepaşe
Lê ristên min wê bibin baz
Li ser serê Mîr û Paşa
Razîbûna milet nadim
Bi xelat û bi şabaşa
Her ez evim wek Donkîşot
Qet ez nakim şerrê aşa

Ferhad bese şev westiyan
Pepûk civyan li dengê te
Bi tirafê xwe pêçana
Ew pizot û perengên te
Içmo digrî li ser xwînê
Li pey vîna lehengên te
Her wê rokê dewran bêje
Sed pîroz bin ahenên te.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Rola Kurdan di kirîza Sûriyê de

Mihyedîn Şêx Allî *

"Di despêka kirîza Sûriyê de, Turkiya AKP-ê, çi aşkere, çi bi dizî, di germkirin û gurkirina hinde hêz û partiyên opozosyona Sûriyê de, xwedî roleke sereke bû, li bajarê Antaliya kongira Encûmena Nîştîmanî ya Sûrî bi serkêşiya (Îslamî siyasî) hate hembêzkirin, dûv re, ev Encûmen hate berfirehkirin, nav lê bû kiwalisyona hêzên şoreş û opozosyonê (Îtîlaf), û Istenbol jê re bû cîwar û navend"

Eve nêzî pênc salane rewşa Sûriyê di sînga weşanan de cî digre û di asta navdewletî de bi dehan kongir hatine lidarxistin.

Çalakiyên ragihandinê yên curbecur hatine bikaranîn û di raya giştî de rola xwe lîstine. Lê, baş xuya bû ye ku, li ba piraniya hemwelatiyên civaka Sûrî û di çavên wan de, ewqas nemane ciyê rêzgirtinê, ji ber ku, hema bi kurtî, ewqas TV, Encûmen, sozên serok û wezîran, rê li ber şerê qirêj teng nekiriye, carna jî bi peyvên qelew û durişmên gerim, ew agira hatiye gurkirin û hêjî berdewam dike. Bê gûman jiyan û berjewendiyên civakê û yên me hemiyan, berî her tuştî di rawestandina xwînherikandinê de ye.

Di despêka kirîza Sûriyê de, Turkiya AKP-ê, çi aşkere, çi bi dizî, di germkirin û gurkirina hinde hêz û partiyên opozosyona Sûriyê de, xwedî roleke sereke bû, li bajarê Antaliya kongira Encûmena Nîştîmanî ya Sûrî bi serkêşiya (Îslamî siyasî) hate hembêzkirin, dûv re, ev Encûmen hate berfirehkirin, nav lê bû kiwalisyona hêzên şoreş û opozosyonê (Îtîlaf), û Istenbol jê re bû cîwar û navend, ji bilî bajarên dî, mîna Gazî Entap, Antakiya, Reyhanlî û Şanli Urfa, … Hwd.

Di siha vê kiwalisyonê de û bi rêdana hin karbedestên Turkiyê, bi hezaran kadro û kesên (mucahîd) û dilxwazên rêbaza rêxistina El-Qa´îde (Ûsame bin Ladin, Ebo Miseb Zerqawî, Mille Umer, Eymen Zewahirî) derbazî hundirê Sûriyê bûn, û ji hêla beşek ji civaka Sûrî hatin pêşwazî kirin, û di bin durişmên serhildana gelê Sûrî de sûd û alîkarî dîtin û cî girtin. Vêca, têkoşîn û serîhildana gelê Sûrî ya aştiyane ya ku, rûmet û azadî ji xwe re kiribû armanc, ji riya xwe derket û beravêtî bû. Ji xwe, desthilatdariya rijîmê jî, çav li rê bû, û bi gelek şêwe û pîlanan hewil dida ku, ew serhildana dadmend bişimite, û dest bi karê çekdariyê bike û berê xwe bide derve û hêviyan li ser sozan ava bike.

Di çerçewa vê tabloyê de, piraniya camawerê Kurd li bakurê Sûriyê karîbû pêşiya xwe bibîne û nebe destik, lewre jî, îro xwedî roleke erênî û balkêşe, nemaze ligel pêkhateyên Ereb, Suryankildoaşor… Hwd, li seranserî herêmên Cizîrê, Kobanê, Girê Sipî (Til Ebyed), Şêx meqsûda Helebê û Efrîna Kurdaxê, li beramber piroje û metirsiyên terora rêxistina Da´îş û Cebhit El-nusra bi serkeftî têdikoşe û li ber xwe dide, loma jî, di qada navdweletî û li ba rêxistinên civaka sivîl li seranserî cîhanê, ciyê rêzgitinekê ye ku, bi rastî dihêle mirov bêje : Kurd di kirîza Sûriyê de rûsipî û xwedî roleke erênî ne.

Hinde dezgehên ragihandinê, di bin bandor û kartêkirina helwestên serokatiya kiwalisyonê de, dixwazin rastiyên bûyeran berûvaja bikin, dibêjin – xwedê giravî – hêza Kurdan li bakurê Sûriyê YPG – YPJ Turkmen û Ereban qir dikin !, Kurd cudaxwazin, hewldidin ku Sûriyê parçe bikin !!

Hêjayî gotinê ye ku, xwediyên van reklam û piropagandên neberpirsyar, li razîkirina AKP-ê û Îxwan Mislimînan digerin, bi ser de jî, şovenîzma li dijî gelê Kurd gur dikin.

Çendî newekhevî û hinde nakokî di çerçewa tevgera azadîxwaz a Kurd de hebin, lê bi tevahî, rasterast xwe li dijî hovîtiya teror û toximperestiyê dibîne, aştiyane û mirovhez e, lewre jî, canfîdayên gelê Kurd (çi Gerîla, Pêşmerge, YPG û YPJ…) di çavên xelkê de ciyê rêzgirtinê ne û di dilan de cî digrin.

Bawerî li cî ye ku, Kurdan bi gelemperî riya xwe naskirine, û êdî baş dizanin ku, bela serê wan û metirsiya li dij hebûn û berxwedana wan, ne Emrîka û Rûsiya ye, ne jî Çîn û Japon e … Neyar û bela serê Kurdan çand û siyaseta nijadperest, hovîtiya terorê û derdê nezaniyê bi xwe ye.

*Sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê

Siyaseta Kurdan Li Civaka Wan Bar Dibe

" Cudakirina civakê dubeş û sêbeş ti berhemên baş bidest naxe, divê civak ne bi awayê hevrikiya siyasî danûstandinê bi jiyana rojane re bike "

Hekîm Ehmed

Helbet, rewşa siyasî bandoriya xwe li hemî hûrguliyên civakê dike, ev di dîroka Kurdan de jî diyardeyeke zelal bû, ku dema desthilateke zordar dihat, Kurd di bin birçîbûn û nezaniyê de diman, lê dema ku hêz dikete destê kurdan de, hemû civak geş û çalak dibû, çi di warê aborî û avahiyê de, çi di warê çand û wêjeyê de be.

Mixabin, di rewşa îroyîn de tevliheviyek heye, ku hêz û serdestî nêzîkî destê Kurdan dibe, lê civaka wan di asta herî lawaz û jihevketî de ye. Bêguman, armancên dûr ên hêzên Kurdan dîsa ji bo xizmeta civakê û pêşveçûna jiyanê ne, lê di demên nêzîk de, çima civak baceyên mezin dide û di gelek waran de dibe qurbana siyasetê?

Li gor ku diyar dibe, mijarine ji civakê giringtir li pêş çavên siyasetmedaran hene, gelek caran ew mijar encamên rewşa cengê ne.

Derdê yekem ku îro hêzên siyasî yên kurdî mijûl dike eniyên şer in û bi taybetî bi "Da'iş" re, ev hêza radîkal a hovane ku ji bo Kurdan jî diyardeyeke nû ye, ji ber ku berê dijmin dewletine cîran bûn ku biryar û kiryarên şoven derbarê Kurdan didane pêş û carina hin berjewendî bikar tanîn ji bo têkildariyê bi vê hêza Kurdî yan a din re.

Xala duyem di lîsteya guhdana siyaseta Kurdî de, têkildariyên bi hêzên cîhanê yên mezin re ye û zelalkirina wêneya Kurdan li welatên ku çarenûsa vê xakê xistine destê xwe. Bêguman, pêwistiya vî karî jî heye, nexasim ku gelek şoreşên Kurdan di van qonaxan de têk diçûn bi sedema berjewendiyên hêzên mezin bi xêrnexwazên Kurdan re. Herdu xalên bûrî pêdivîne babetî ne ku pêvajoya bûyeran, wan li sersiyasetmedaran ferz dike, ji bo vê gelek bîrewerî di civakê de gerek e, stûbariya hevbeş ya siyasetmedar û rewşenbîran e ku civaka xwe hişyar bikin bi zehmetiyên ku di vê cengê de wê derbas bikin û pêdiviyên buhurandina vê qonaxê ji bo civak, mirov û malbatê zelal bibin, herweha wêneya Kurdan divê bimîne mafxwaz û mirovhez.

Xala sêyem ku aliyên Kurdî bi hişkî digirin, berjewendiyên partîtî ne. Metirsiyên vê jî gelek in weke rahiştina hin ecendeyên dûrî Kurdewariyê bi sedema hevrikiyê, berhemdana diktatoriyên zordar ku gelên cîran ew ezmûn bi êşine mezin bûrndine, ji xwe dêwê birakujiyê her demekê gefan dixwe ku birînên kevin û nû veke.

Bêguman, ji bo vê xalê bêhtirî hişyarkirinê dive, pêwist e ku hemû alî di warê siyasî de awayên têkildariyê peyda bikin bo berjewendiyên civaka xwe. Cudakirina civakê dubeş û sêbeş ti berhemên baş bidest naxe, divê civak ne bi awayê hevrikiya siyasî danûstandinê bi jiyana rojane re bike, kesê ku di ber xizmeta xelkê de biweste, nabe minetan li cîranên xwe bike û kesê hîna xwe di civaka xwe de biyan û xeyidî dibîne, divê hevkar be ku barê xelkên wî sivik bibe, pêdiviyên wan ên jiyanê peyda bibin û nema êdî navtêdana alîgirî û dijheviyê bike, şermeke mezin e ku em bihêlin du cîran an du bira li hev binerin weke desthilatdarekî zordar û sitembarekî noker. Gerek e, aliyên hevrik diyariya xizmeta civaka xwe de jî xebatê bikin û civakê yek bibînin, da ku sazî û dezgeh jî bibin yê tevaya civakê û ji bo tevaya civakê, ev berpisyariyeke dîrokî ye, tevî ku tiralî û nezanî jî kelemine mezin in di vê qonaxê de.

Helbet aliyên van nakokiyan ên babetî jî bi hêz û bandor in, ronî bi destê rêvebirên vê zemînê hate vemirandin û em nizanin çi li pêşiya me ye, sitemkarên me yên kevin bûne alav û alî di vê lîstikê de, her herêmek di rewşeke taybet de derbas dibe, hemû bûyer û biryarên li derdorê û li cîhanê bandoriyeke rasterast li me dikin.

Lê eger defterên hesab û rêjeyan di vê qonaxê de werin girtin, nirxandina ku li gor durişman me durist û şaş dabeş dike raweste, cudahiya di navbera rexnê û êrişê di ferhenga me de were zelalkirin, wê rûpeleke nû ji xebatê destpê bibe ku bingeha wê dilsozî be, ne dilsoziya razber ku her yek ji me li gor xwe rave bike, lê dilsoziya berpirsyar ku kar, reftar, xizmet, rol û giringiya her kesekî diyar bike.

Nabe di vê guhertinê de xeyd hebe, xeydok koçberên rasteqîn in ku yan li gor hest û ramanên xwe, li derveyî dem û cihê xwe dimînin, yan jî dem, cih û civaka xwe, li gor xwe dibînin.

Şahînê Bekirê Sorekîi

(Shahînê Soreklî chi guherandinê di berhemên xwe de napejirîne, qebûl nake. Berhem divêt wek hatiye nivîsandin bihêt weshandin)

Pêlên bi Girr

Nedizanim çima derya îroj weqa bi girr e. Pêlên wê yek li dû ya din bilnd dibin, bi hêrs ber bi zinarê reş dihên û xwe lê dixin. Xuşexuşa wan e! Dema li zinêr dikevin ji hev diçirrin û kef bi ava wan ya ji hev belav bûyî dikeve. Tu çima dîsa weha xeyidiye, deryayê? Gelo ji ber wê yekê be ku nijada mirovan vî erdî bi te re parvedike? Lome li te nabin, deryayê! Parvekirina û tevjiyana bi mirov re ne hêsan e. Xweristê jî bi mirovan nikaribû, û tu dibêjî qey t'adekirina li planêta erdê têrê nedikir wa ye mirov bizava xwegîhandina planêtên din jî dikêye!

Duhinî şarkekî* te hêrîş bir ser ciwanekî û laşê wî bi encamê bû du beşan. Xwîna wî ya şor û ava te ya şor li nav hev ketin û bihara jiyana wî qurçifî. Ew û hevalên xwe di van rojên zivistana başûrî de jî nikaribûn ji te û lawirên te dûr bimana û heta bi girr û hêrsbûna te be jî ew netirsandibûn. Ew derketibûn nêçîrvaniya pêlan da ku li wan siwar bibin. Şarkekî te xîje wî ciwanî kir û gezeke bi diranên xwe yên tûj li navenda giyanê wî xist, kir du beşan.

Şeva çûyî hemî çaviyên televizyonê li welêt nûçeya hêrîşbirina şarkê te û kujtina wî ciwanî belav dikirin. Hinan daxwaza dîtin û kujtina şarkê mezin dikirin. Digotin, ger nehêt kujtin ew ê ji xwe re bike sinçî û şûna ku ciwan lê kujtibû bike warê nêçîrvaniya xwe. Kî dizane, heye ku va sinçiyê wî bi rêya cînan (shopên wîrasî; bi înglizî: genes) derbas neviyên wî jî bibe. Hinên din digotin, na, dest ji şarkê mezin berdin. Ma ne war warê wî ye û yê çûyî li pêş mala wî nêçîra pêlan bike mirov e! Brayê ciwanê hatî kujtin peyivî:

"Dest ji şêrk berdin. Ne ez û ne endamên malbata min, em tolwergirtinê (heyfhildanê) naxwazin. Kujtina wî brayê min zindî nake. Ger brayê min bikaribûya a nuha biaxafta, dê bigota "Na, mirovî maf niye şarkan bikuje; ew li mala xwe ye, em dest jê bernadin!" Şark ne neyarên mirovan in, ne jî li dû mirovan in ku goştê laşên wan bo xwarinê bi kar bihînin. Şark hêrîş dikin ji ber ku weha dizanin ew di tehlûkeyê de ne. Wan jî mafê malparastin û berxwedanê heye!"

Deryayê! Li welatê ku ez lê ji day bûm tolwergirtin erkekî pîroz e. Day ji dergûşê di zikê xwe de wergirtina tolê hêvî dike, wî bo wê amancê xwedî dike, xewnên xwînî bi wî dîtin dide, û hîn berbext nebûye rêdike kiryara tolwergirtinê. Welatên herêma ez lê ji day bûm ji deryayê dûr in, lê tiji şarkên duling in. Şarkê te ciwanekî 17 salî, ciwanekî zîrek û jêhatî, kujt û xwediyên wî li dij wergirtina tola wî ne!

Deryayê! Di mizgeftên Rojhilata Navîn de ewên xwe kirinî nûnerên Xwedê bi navê wî fermanên kujtina mirovan didine. Di taxên hinek welatan de ne xwîna mirovekî lê xwîna gellekan dihêt rijandine. Rind e ku çavên te wan welatan nabînin. Ger bidîtina pêlên te dê ne ku tenê hêrs bû bûna, pêlên te dê dîn bû bûna. Dirêj nake tu dê dîsa aram bibî, deryayê! Jê pê ve çare niye, çimkî tu çiqa hêrs bibî jî mirov ji ber xwe ve şerm nake û bi çak û neçakên xwe ve dê her bimîne; yek ê li vir bimire lê du dê li dera han ji day bibin. Ew ê li pêlên te jî siwar bin, ew ê şark û hûtên te jî bikujin û heta bi masiyên te be jî dê ji te bidizin.

Wa ye xweristê keskesora xwe wek şana ku aramiya te li rê ye li aso raber dikêye. Pêlên te dê nizm bibin û bi asîmanî re bikenin. Zinarê ku wan xwe lê dixist jî dê raketî li şûna xwe bimîne. Nedizanim va çend milyon sal in tu li ser vê planêtê yî, lê bawer dikim tu dê li dû bi hezaran salên din jî her li vir bî, ger mirov planêtê wêran neke. Di wan salan de bi milyaran ji nekes û kujer û derewîn û bêbext û serserî û gemarçêker û bedkesên mirovan ê hatibin û çûbin, ji day bûbin û dû re bûbin xwelî; bêguman hinekên rind jî ê kiryar û şopên bedew û qenc li dû xwe hîştibin. Çi baş e ku mirovên çê jî hîn hene û tu dê her hebî!

Vê dûnîvroyê ez bi saya te û pêlên te xwe zindî û bextiyar hest dikim. Di dema girr û hirsê de be jî hûn xweristê bi min nerxbilind dikin û di heman demê de bêhna min fireh dikin. Bila hûn her hebin.

* Şark: Bi înglizî Shark. Mezin masiyekî bi qîlên dirêj û tehlûke.

Gotarên Weşandî Nerînên Xwediyê Xwe Ne

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Kê Helbesta « Rebename» Li Ser Cemîlê Îso Hûnandiye..

01 - Mukirîyanî di bin dilopên mala Haco de helbest ji min re xwendin
02 - Cegerxwîn helbestek li ser min hûnandibû.
03 - Min nanê zarokê xwe ji gerandina rojname û pirtûkan derdixist.
04 - Hema tev de dihatin wê Tilşi'îrê, û navê wê kiribûn Moskoya Biçûk
05 - Yê zabit ez bi hespekî ve girêdam û min li gundê Tilşi'îrê gerand.
06 - Dibistana me xaniyek ax bû, û ji bilî du-sê pênûsan lê tunebû…!
07 - Rundikin germ ji çavê Mîr Celadet Bedirxan dihatin dema ku dît ciwanên kurd fêrî zimanê xwe dibin

Hevpeyvîn

Ehmed Bavê Alan

Cemîlê Îso li bajarê Qamişlo kesayetiyek naskirî ye, û nexasim di nav kesên temen mezin, û xwedî kar û bizav di tevgera kurdî de.
Vêce ji ber ku Apê Cemîl xwedî hêzek mezin, û dileke fireh bû, her tiştên qedexe di riya wî re dihate gerandin;Peyam, belavok, rojname, û vexwendin. Gelek caran peyamnêrê Seydayê Cegerxwîn bû, dîwanên wî li gundan digerandin, ji wan re helbestên Seyda dixwend, ew bi xwe gelekî bi Cegerxwîn ve hatibû girêdan..!
Piştî ku temenê Apê Cemîl mezin bû û bê çare ma, ew xebat ji xwe re kir karê rojane,û bi vî awayî abûr û tedbîra xwe kir. Rojnameya (Xebat) gerand, pirtûk di bin çakêtê xwe de veşartin û frotin, û her kesê ku li sikakê pêrgî Apê Cemîl dihat, û pê zanîbe ku ew ji pirtûkên kurdî hez dike, yekser bang dikir wî kesî, û pirtûkên li rex xwe difrotinê.
Mebesta min ji Apê Cemîl û vê raportê, ew e; ku ev ciwanmêr hatiye jibîrkirin. Ew kesên keysebaz ku ewqas karê herî zehmet û bi tirs bi Apê Cemîl kirin, û di roja tengayê de dev jê berdan, ne serdan û ne alîkariya wî kirin, û ne jî carekê ketiye programê xelatan ji rex tu dezgeh partiyan ve.
Lê mirovê dil mezin û fireh, helbestvanê hêja û bê hempa, Seydayê Cegerxwîn ew û xebata wî jibîr nekir, helbestek bi navê Rebename jê re hûnand.
Me Cemîlê Îso dît, lê mixabin guhê wî alîkariyê pê re nedikir û qet jî jê nayê ku vî guhê qels derman bike. Lê em ê çi bikin ku jiyana me kurdan wisa bi rê ve diçe…!? Em kar dikin û di dawiya jiyana xwe de bê deng, kes, û xwedî dimînin, û herweha bê kes û deng jî bar dikin.
Wek ku Cemîlê Îso dibêje: Ez li gundê Tilşi'îrê hatime dinê. Di sala 1927an de şivanê gund bûm, û hingî ez di zarotîya xwe de xidmetçî bûm, min her kar dikir û dilê kesekî nedihişt. Rojekê Seydayê gewre Mele Ehmedê Namî Ji min pirsî:
"Cemîlo çima tu nayê xwe fêrî dersên kurdî nakî?"
Min got: "Ezbenî ez feqîr im û nikarim werim dersan û ji dev şivantîya xwe berdim.
Dîsan bavê Samî got: "Cemîl xeman nexwe ez ê destûra te ji muxtêr bistînim.
Vêce wisa çêbû, ez çûm û bûm şagirt li rex Bavê Samî ew kesê ku ji bîra min hîn jî neçû ye.
Dibistana me xaniyekî ax bû, Bavê Samî xwe gelekî bi me re diwestan, û ji pêvî du-sê pênûsan tunebûn.Tê bîra min ku hevalekî me di dibistanê de hebû navê wî Parox bû, Paroxo Cihû bû, hate dibistana zimanê kurdî lê ew malmîrat, bû yê yekem di dibistanê de. Bavê Samî gelekî jê hez dikir. Min û paroxo dîwana Seydayê Cegerxwîn tev de ezber kirbû, lê kê zanîbû mîna Paroxo helbestên Seyda bibêje. Wî dîwana Seyday bi pênc wreqeyên Sûrî kirîbû, û piştî ku wî bidawî kir da min, û min jî bi dawî kir.

Bavê Idrîs berdewam dike: Hingî min ji Seyda hez dikir, ez diçûm serdana wî li Qamişlokê , gelek caran, ji min re digot:
"Cemîl ka ji min re wê helbesta (Fala Qereçiyan) bibêje, Vêce min tev de digot û bê yek şaşî jî, Seyda gelek kêfxweş dibû û digot: Maxane Cemîl pa bi Xwedê tu ji min xweştir dikî."
Seyday ji min gelek bi ewle bû, her tiştên xwe digotin min, û her tiştê ku raz û nihan bûn, didan min û min dighand devera ku wî dixwest.
Min cara yekem Apo Osman Sebrî dît li Qamişlo bû, me ji Apo Osman xwest ku tenê em Ala kurdistanê bibînin. Wî got:
"Ez ê ala Kurdistanê ne tenê şanî we bidim lê ez ê alê diyarî we bikim, wisa hûn mîna min dilşewatê Kurdistanê ne, lê jibîr nekin ku ala me li welatê Sûriyê qedexe ye, û hun werin girtin wê we bidarve bikin. Lê kî we bigre bêjin ku em xeşîm in û em nizan in ku ev ala kurda ye, û Osman Sebrî daye me"
Apê Cemîl berdewam kir: Ez matmayî mam ji vî mêrî wisa qehrman, û wisa jî kurê wî Welato got:" Na nexin stiwê bavê min de bêjin Welato di ber vê alê de berpisiyar e ". Lê mixabin Welato zû hat kuştin..!
Vêce me ala xwe bir gund, me agir li dor wê vêxist, dîlan kir û me helbesta Apo Osman got: "Kesek û sor û zer e Sipî û gewher e". Rondik ji çavên me dibarîn, ew cara yekem bû ku ez ala xwe dibînim! Û Apo Osman digot:
" Xema nexwin, çiqas dirêj be ev westana me bê sûde naçe, û her wê rojek were û mafê gelê kurd bê standin".
Celadetê Bedirxan hate Tilşi'îrê, mihvanê Bavê Samî bû, em dane hev û ji me re got:
" Ka we çawe tîpên kurdî ezber kirine? Me tevan tîpên kurdî jê re xwendin, pir kêfa kurê mîrê Botan hat, çepik ji me re dan, me jî sirûda marş - wisa jê re dihat gotin - me sirûd kir:
Herne pêş herne pêş dewr û dem ya we ye
welat çav li rê bendewarê we ye.
Rundikin germ ji çavê Mîr Celadet Bedirxan dihatin dema ku dît ciwanên kurd wisa fêrî tîpên kurdî bûne, û soz da me ku ew ji me re pênûs û rûpelan bîne, soza xwe bi cîh anî û her yek ji me bû xwedî dusê pênûs piştî ku her du -sê ji me bi pênûsekê bûn!
Apê Cemîl dibêje; û diyar e me dilê wî gelekî - ji van pirsên ku me bersiva wan xwest - arandiye:
Min helbestvanê gewre Hejarê Mukiriyanî gelek caran li Tirbesipîyê dît, carnan min peyamên wî jî dighandin benaciha wan. Carekê di şeveke zivistanê de bû baran dibariya, ez û Mukiriyanî di xanîkî ax de bûn, ew gelek ji wê rewşê aciz bû û digot:
" Cemîlo! Binêre ez Hejarê mukirîyanî me ez kurê malbatek dewlemend im, û mala Haco ez kirime vî Xaniyê axî de, dilop bi ser me de tên xwar"
Em wê şevê gelekî keniyan û Seydayê Mukirîyanî di bin wan dilopan de helbest ji min re xwendin, dûv re ez dihûnandin. Gelek ji helbestên Mukirîyanî li Tirbesipîyê afirîne.
Nûredîn Zaza..! Min kesek wisa mîna wî nazik û pêşketî nedîbû, ewqas ew zana û welathez bû. Min Du caran ew dîtiye, carekê Dr. Nafiz Begê - ji xwe Nafiz begê birayê Dr. Nûredîn bû - şandibû pey min, bi lez min da ser rê û ez ji Tilşi'îrê çûm Qamişlokê, maxana min bi rê de digot: Kuro Cemîloê.. Lez bike ma tu kî yî ku ewqas Beg û Mîr û Paşa te dixwazin!? Car caran di nav gundiyan de ji ser xwe diçûm. Ez giham nexweşxaneya Nafiz Begê, min dî wa xortekî wisa cil û bergên wî pêşketî bûn, merov dizanî ku ew malmezin û pêşketî ye. Nafiz begê got:

"Cemîl ev birayê min Nûredîn Zaza ye û binêre wê çi ji te bixwaze alîkariya wî bike. Min jê re gotiye wê Cemîlê Îso karê te biqedîne".
Maxana dema ku got: "Ev birayê min Nûredîn e", lotik ji kêfa re hatin min, min navê wî bihîstibû lê min ew nedîbû. Dr. Zaza hin peyam dane min ku ez wan bighînim navdar û mezinên êl û malbatên Kurdan, û diyar kir ku dema wî kurt e, û Nafiz Begê li te ewle bû ta ku ez van peyaman didim te.
Û êdî min û wî baş hev nas kir, û gelek caran dihat Tilşi'îrê li rex bavê Samî, ew bi matorekî duling dihat serdana me. Dr. Zaza gelekî zana bû, bi gelek zimanan diaxivî, û gelek sipasiya Mele Ehmedê Namî ji bo karê wî di dibistana kurdî de dikir, û digot şagirtan: "Bê xwendin em ê bimînin şivan û kole".
Li Tilşi'îrê min kî dît û min kî nedît..!? Hema tev de dihatin wê Tilşi'îrê, û navê wê kiribûn Moskoya Biçûk. Hemzayê Niwêran, û Reşîd Hemo jî dihatin li rex Bavê Samî. Carekê min dît xortek bi wan re hat, hîn ne mezin bû jî lê diyar bû ku jîr û zana ye, û di civatên wan de diaxivî. Min got xwe: Maxane ev kî ye wisa li civata van zaniyaran e. Min yekser pirsa wî kir, ew Hemîdê Hecî Derwêş bû. Min ew nas kir, xortekî gelek zana û hêz xurt bû, tevlî ku ew gelek bi temenê xwe ne mezin bû lê serê min dagirt. Demek baş li Tilşi'îrê ma, bûme hevalê wî, ew jî li min ewle bû, û min peyamên wî bi dizî dighandin malbat û hevalên wî. Hemîdê Hacî Derwêş jî ji me dixwest ku em fêrî her tiştî Siwêdê bibe, ez çend caran çûm rex wî, ji min re got: "Cemîloooo welah tu westiyayî ez tucarî keda te jibîr nakim "
Roja ku min bi koça Seydayê Cegerxwîn bihîst dilê min êşiya, û min birin nexweşxaneyê, pirr li ser wî aciz bûm, ez beşdarî Rêûresmên veşartina laşê wî bûm. Û bêhtir ji mehekê jî ez her şev mihvanê gorna Seydayê Cegerxwîn bûm, min şeva xwe li civata wî diqedand, û min dîsan helbestên wî jê re dixwendin.
piştî ku apê Cemîl baş li ser Cegerxwîn axivî, êdî helbestê wî û hindek ji yên Seydayê Namî, ji me re xwendin, û dîsan axivî û got: Min gelek peyamên ku ew raz û nihan bûn dibirin benaciha wan, ji min re digotin: "Cemîl hingî em li te ewle ne, em van peyaman didin te".
Ez bûme endamê (P.D.k.S) û êdî min belavokê wê digerandin, û paşê min yekser ji xwe re kir kar, min nanê zarokê xwe ji gerandina rojname û pirtûkan derdixist. Ma çi bikim êdî piştî ku kadirên Partî çêbûn ,min hiştin bi tenê û nema kesekî guh da min. Êdî min rojnameya Xebat, Sûlav, Metîn, û Gulan digerand. Xelk li min digeriyan, û doza xwestekê xwe ji pirtûk û rojnameyan dikirin.
Apê Cemîl berî ku civata me bidawî bike, got: Ez deh caran hatime girtin, cara yekem di sala 1956an de bû, û yên dî hew tên bîra min. Ew zabitê kafir û bêbav Hikmet Mînî zabitê muxaberatan bû, ez gelekî êşkence dikirim, û digote min:
" Tu wan peyaman ji kê re dibî ?".Maxane Wellah wek ku li hespekî :ora kurdî, û ew baş li ser me xebitî, û bû alîkarê Seydayê Namî. Min di dilê xwe de digot: Rojekê wê ev xort di nav kurdan de bibe tiştek, şensê min baş e ku hevalê min e, wê alîkariya min bike. Hingî em feqîr bûn û ez şivan bûm, hema min digot ez karekî dî ji bilî karê şivantîyê bikim.
Min çîroka ku Seydayê Cegerxwîn helbestek bo min hûnandibû nizanîbû, lê hinan ji min re got. Dema ku min ew helbest xwend nema erdê ji kêfa re ez girtim, rondikên min bêvîn herikîn. Maxane ewqas salan ez westiyam û rezîl bûm, kesekî ji min re negot mala te ava, niha Cegerxwînê dil mezin û gewre, ji bo Cemîlê Îso helbestek hûnandiye..! Berî ku Seydayê Cegerxwîn koçberî bixe. Naherê! Qet min eşkere nedikir. Ji êşkenceya min diwestiya û min tiştek nedigot! Carekê jê re hatibû gotin ku Cemîlê Îso Peyam birine Kurdistanê, mane di nav me kurdan de jî fesad û 'ewan hebûn! Vêca ew kafirê Hikmet Mînî hate Tilşi'îrê, ez girtim û bi hespekî ve girêdam û li gundê Tilşi'îrê gerandim. Ez wê carê gelekî êşandim, ji hiş ketim, êdî piştî ku ez bi hişê xwe ve hatim, min dît ku ez di zindana Qamişlo de me. Axxxxx, tevlî ewqas êş û azaran jî , ew roj çiqas xweş bûn ….!?

Rebenname[1]

Cegerxwîn

Heval, Cemîlê pir Cemîl
Xebat bike wek shêr û fîl
Tu guhmede sed qal û qîl
Ji dil bike qîr û hewar
Rû tev xurî, çavê te kor
Ronî te daye tor û zor
Dengê te çûye ber bi jor
Dil paqije, pir qence kar
Bike hewar û sed eman
Bibêje wan kurdên nezan
Win dar medin pîs û dizan
Sitûr mekin li ser xwe dar
Turk û neyar tev hevrikin
Niha sherê Qibris dikin
Pashê dizanin wê çikin ?
Li ser pishta me bin siwar
Bike hewar û nalenal
Gazî bike kurdên shimal
Yekser bibin dost û heval
Va çûçika genmê we xwar
Gazîke nevyên Mîdîya
Bes xwe bikin rengê miya
Derkevne ser shax û çiya
Ji we ditirsin tim neyar
Ta kengî wer razin di xew
Li ber neyaran çêlekew
Îdî mirin nêzîke lew
Divêm ji xew rabin shiyar
Dostê neyarin, dewlemend
Êko bi dest wan mal û gund
Parsek ji nû bûn serbilind
Hishyar dibin em bêjimar
Milet emin, xwedyê welat
Divê ku em rabin xebat
Pakij bikin tev Rojhilat
Ji xap û rîpên koledar
Van shêx û pashayên nezan
Em xistine destê dizan
Heval, tu vê j i min bizan
Tirba sipî û dûvê mar
Ev Turk û Faris , yan hemi
Xwina me mêtin wan timi
Korin, nizanin ev gemî
Kuve diçi, ki lê suwar ?
Roja me ji nêzike, tê
Dernakevin j i vê xetê
Bigrin bi dest xwe dewletê
Ko çu zivistan, tê bihar
Bihar bi me pir xwesh dibi
Her kes bi wê rûgesh dibi
Riwê neyaran resh dibî
Serê xwe ranakin tu car
Dijmin dibin lingan kevi
Rev jî bi destan nakevi
Bo me dimêni ev zevî
Têde dijîn em payedar
Têde bij în em tev bira
Xwendin bibî rengê çira
Winda bikin an va gura
Bi perçiqênin rengê mar
Milet hemî girbêj bikin
Toz û gemarê rêj bikin
Jîna welat dirêj bikin
Pêsh de herin ezman û zar
Em zorê bidne xwendinê
Pir xwesh bikin an vê dinê
Serbesti bidne dest jinê
Îdî nemênin zarezar
Divê ku jin azad bibi
Wekî me ew dilshad bibi
Perda seri berbad bibi
Wê pir ji me tehlî vexwar
Tehli heri, shêrîn vexwî
Lê xwe j i rê pir dernexî
Ji vî rexi, ji wi rexî
Divêm bibin bi pishk û par
Jin mêweke shêrin bere
Dara evine, tim tere
Sedef ewe, kur gewhere
Sîng bexçeye ew gulizar
Heval Cemîl, hêvî û lav
Bighê hevalan sed silav
Ûsvê letîfê ew bi nav
Li kû dikî gesht û guzar ?
Reben hemî dostê me ne
Çibkim ji me, bê lome ne
Çavnêrî vê benda me ne
Qada me pir maye beyar
Kor û kulek û bawîya
Mest û hejar û tawîya
Heta bi tat û shawîya
Wan dil ji vê jîna me sar
Heval û hemyarê me ne
Çavnêrê vî karê me ne
Herdem jî guhdarê me ne
Hemî belengaz û hejar
Hemî belengaz em yekin
Ji hevketî ne, bê çekin
Dijmin dixwazî deynekin
Di nav me danîn dilgemar
Em tev birane narevin
Xurtin, ji hevdî nakevin
Em kareva ne ew shevin
Qewam li kuye, ka beyar ?
Ew tevde çûn ber av û av
Heta bi lêvan bûn çirav
Maye ji wan yek pîsenav
Milet sitûre wek zinar
Ka Qeyser û Ebdil Hemid ?
Ka Feysel û Sultan-Wehîd ?
Kanî Rizaxan û Mecîd ?
Ka Xusriwê zêrî Guhar ?
Ew pêkve çûn, milet heye
Wî guh li vî dengê me ye
Herçî dibêjin jêre ye
Ziyan ji bo me, jêre kar
Çend sale em bi qîr û lew
Dey lê dikin: rabe ji xew !
Dijmin bibî wek çêlekew
Bimrin sehên devlok û har
Da bêne kushtin ên nebash
Ew zorkerên wek gornepash
Em ash bidin destê qerash
Da rast bikin herçî ku xwar
Da xwarîya em rast bikin
Qenc û neqencan nas bikin
Milet j i wan xelas bikin
Qadê leva kin pishk û par
Qadê li hevdî par bikin
Pêkve bi hev re kar bikin
Ên çav li xew shiyar bikin
Da kes nebê: xwezî bi par
Pir xwesh bibin hebûn û jîn
Pêkve bi dilshadî bijîn
Îdî Ciger nabî bi Xwîn
Bes em dikin qîr û hewar.

[1] -Ev helbest ji dîwana (Şefeq)e, û ji şêst û heşt malikan e.
- Ev nivîser di rojnama Nûdem de hijmara (0.1) hatiya weşandin

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Jiyana Civakî Li Cezîrê

Selah Mihemed



Du tişt dihêlin ku insan bê xuyakirin, bi pêş de here, û di jiyana xwe de şa bibe; pêşketina aborî û pêskulojiya insan.

Çi civaka ku li terazuwa xwe bigere, gereke ku li aboriya xwe miqate be, û li rehetbûna milletê xwe û gelek pirsgirên di nav civakê de çêdibin, ji ber gerekên aborî, û pîskolojî yê herema Cezîrê, ev navpana heşîn parçak ji xaka Sûryayê, bi alîkariya ciwîlekan ê ku hiştine ku ev herêm bibe buhuştek li ser rûkê cîhanê, ji ber vê yekê gelê herêmê, tev de bi yek dest hiştine aboriya welat bigihe asteka pirr bilind, û ji aliyê civakî, zaniyarî û rewşenbîrî ve, ji milletê herêmê pirr gavên mezin avêtine ber bi pêş ve.

Gava ku em li miletê herêmê mêze dikin em dibînin ku ji gelek milletan pêk tê: Ereb, Kurd. Aşûrî, û Siryanî, û bilî wan jî gelek milletên din jî hene, tev di vê deşta pirr bi xêr û bêr de civiyane, û ji ber zilm û zora Osmaniya baz dane.

Di pêşî de vî milletî nikarîbû ku bi hev dû re bije, ji ber ku hêjî ew kîn û buxza ku dijmin xistibû dilê wan de, hê derneketibû ji ber gelek sedeman, Ji wan sedeman me berê gotiye, ew kîn û buxza ku dijmin xistibû nav millet de, nakokiyên ku xistine nav misilman û olên din de, û ew regezperisitiya ku xistiye nava gel de .

Sedemek din, ew nexweşiya ku ketiye nava civakê de ew nexweşiya ezezî, ya ku gelek kesan xwe pê girtiye ku hiştiye gel dûrî hev bikeve, û bi erzanî bên firotan .

Di baweriya min de hevgirtina gel mercekî sereke ye ku ev millet jihev dûr nebe û jihev nekeve, bimîne komek hevgirtî û yekperçe.

Lê civaka nerast dihêle ku millet dûrî hev bikeve, nahêle ev millet bigihê hev, dihêle ku millet komikan û çeperan jihev dû re çêkin.

Em nikarin jiyana xwe ya rojane ya civakî xweş bikin, bi ya aborî re ta em jiyana xwe, yanî pîskolojiya xwe ya civakî bi riya yekîtiyê re xweş neki,.

Heger em jiyaneke nû nedin milletê xwe û baweriya wî bi netewa wî neyînin, em nikarin misogeriya berdewamiya jiyanek nû bidin vî milletî, nikarin wî li ser riyek rast û durust perwerde bikin, bihêlin welatê me li ser yekbûnekê ava bibe, û li ser bingehek rast û durust raweste.

Gereke zarokên herêmê taybetî yê herema me li ser hizkirina gelê xwe perwerde bibin, ji ber ku ev dem nema mîna dema berê ye, hozîtî, eşîrtî, û gelek tiştê din e, niha nema dema cudayetiyê, ol û mezheba ye, divê em tev de ji bo welat û millet xwe tev de kar bikin, em nebêjin, ev ji filan milletî ye ew ji filan mezhebî ye, û ji filan olê ye, da ku em welatê xwe di nav welaten de bigihênin asteke bilind, , bi hev dû re tê de bijîn, û jiyana xwe li ser xaka wê berdewam bikin.

Ji aliyekî dî ve, em lê binerin, ku ev yanê werzeşî û kultorî, û hevgirtina ciwîlekan, bazirganî, kişt û kalî, çêkirinê û hemû karûbarên di welatê me de, dide xuyakirin ku milletê yekdest û bi hev re bi avakirina vî welatî re ye.

Û di dawiyê de ku em li navçeya Cezîrê dinerin em dibînin ku ji aliyê aborî û çandiniyê de gelek gavê giring ber bi pêş avêtine, ji çandiniya genim û ceh û pembo de be û bilî tiştê di bin zemîna wê de veşartî ne.

Şevên Amûdê

Qadir Egîd

Şevên zivistanê dirêj in, nexasim berî bîst û pênc - şeş salan ku alavên ragihandinê kêm bûn. Kolanên Amûdê ne zifitkirî bûn; hewq û çamûr bûn, eger libek baran ji ezmanê Xwedê bibariya kolanên bajêr dibûn gol… Di wê demê de xelkê zû xew dikir.

Dê û bavê min jî yek ji van kesên ku eger şevbuhêrkvan tunabana, serê xwe ji ser sicada nimêjê radikirin û li ser palgehê li ber şûrê xewê radixistn.

Bi vemirandina çirayê nedibû tu kes ji kuflet - Ta ku xewa me nehata jî - destê xwe li ber siltanê xewê hilda;...! Bavê min her dem; bi helkeftin û bê helkeftin digot:

- "Wek mîhan bin, ne wek kûçikan bin. Kûçik ta destê sibeha li kuç û kolanan li ser serguwan digerin, û di dema xêr, ibadetê û bereketê de; dema nimêja sibehê serê xwe datîne ser teriya xwe û xew dikin. Lê mîh piştî nimêja Eşa radikevin û dema xêrê serê xwe hildidin û radibin. Bera hûn jî mîh bin ne kûçik bin."

Min mebesta bavê xwe fam nedikir,lê tevî wisa jî min dixwest ez mîh bim û ne kûçik bim.

Tê bîra min bedlê min ê livîna li qurzîka hêwanê bû. Kuflet tev de li hêwanê xew dikir, her du xwehên ku ez ji wan mezintir û birayê ku ji min mezintir.

Bi vemirandina çirayê, êşên min pêdiketin, êşa tirsa ji tarîtiyê û tirsa ji qaçaxçiyên ku riya wan di pişt mala me re bû, di heman qorzîka hêwanê ya ez tê de wekî kulorekê heta sibehê -ji tirsa re- ji hev venedibûm. Ji Qerpeqerpa lingên hespên wan min digot belkî di hêwanê de, di ber serê min re derbas dibin.

Tirsa din, ji kuleka derî ya camşkestî bû, nemaze di rojên ba û baranê de, gelek caran ew palgeha ku diya min bi şev dixist wê kuleka camşkestî de diket, bi terpîniya wê ez li qûn rûdiniştim, min bang li diya xwe dekir û min av jê dixwest. Û wilo diya min hay dibû û radibû dîsan ew palgeh dixist cih de û di ber xwe de digot:

- "Van bêxwediyên pisîkan girê xwe ji vê palgehê girtiye."

Wê çaxê min jî xwe bi hêdî dişemitand hembêza wê û min destê wê li xwe digerand. Şevên wilo min tirsa xwe binax dikir, lê dilê min bi her du xwehên min dişewitî; ew şev jî kêm bûn....!

Ramanan min dibir û dianî. Gelo qaçaxçî digihên heta kîjan sînorî? Gelo hespên wan dikare di şevekê de bigihe Şamê -cihê ku birayê min lê leşker e - û vegere? Nizanim pencereya wî jî wekî ya me şkestî ye, wî ne sar e? Striyên enîşk û çongên wî rehet bûne?

Pîrekên tarê herdem digotin:

- "Zibatên wan gawir in, rehm di dilên wan de tune ye"

Ji ber vê yekê min jî her şev jê re dua dikirin, ez jî ditirsiyam ku rojekê ilmê wî ji me re bê; ew gawir wî bikujin, ji ber em misilman in...!

Şev li min dibû heft şev.....!

Serweriya Nêremejî Civaka Mirovahiyê Pêş Naxîne

Vejîna Kurd

" Eger em bixwezibin pêşketin û şaristaniyê bistînin, divê berî her tiştî em mejiyê xwe ji hemû ezîtiya nêremejîtiyê bişon"



Bêguman ewlehî, aştî û demoqratî stunên serkeftina civaka mirovahiyê ne, vajayî wê jî zordarî, setemkarî û lihevnekirin hilweşandina wê ne. Lê mixabin heya roja îroyîn jî hîn zihniyeta dijîtî û zordariyê di mejiyê mirovan de cihekî mezin girtiye, û di jiyana rojane de ew di têklî û danûstandinên bi kar tê.

Diyardeya zordariyê gelek kevnar e, û her kêlîkekê, li vir an li wir, di meydana mirovahiyê de dijene, aştî û ewlehiyê binpê dike..... Eger em bixwezibin wê binasin em dikarin bêjin ku zordarî şêweyek an lebateke mirovan e, ku hêz, zor û dijayetî ji aliyekî ve dertên " dibe ew alî mirovek, civakek an jî destlatek be" û li dijî aliyekî din bikar tê, armanc jê ew e ku aliyê duyem bindest bike, û bi wê helwestê re jî gelek ziyanên aborî û derûnî derdikevin holê. Di vê gotarê de, me xwest em girîngiyê bidin zordariya "şideta" ku li dijî jinan tê kirin, ji ber ku tu roj derbas nabin û em nebihîsin ku zordarî li ser jinekê, bi awayekî eşkere yan bi rêbazên veşartî diqewime. Ew jî tinazeke mezin e di dermafê rûmeta mirovahiyê de, û windabûna mafên mirovan e, û ew li ser bingeheke kultûrî, civakî, aborî, siyasî û yasayî ava dibe. Belê; zordariya ku li dijî jinê tê kirin pirseke piralî ye, divê ne tenê jin, lê pêwîst e her kesê xwe mirov dibîne di kesayetiya xwe de raweste ku çiqasî li ser jinê destlatdar û zordar e, ji ber ku ev diyardeya di nav hemû pêkhateyên civakê de tê dîtin, û tucarî ew bi aliyek ji aliyên civakê, yan ol, çand, pêşketin û şaristaniya dewletekê yan jî paşdemayîna wê ve ne girêdayî ye.

Birastî; şêweyên zordariyê pir in wek lêdan, kuştin, destdirêjiya seksî, bazirganiya jinan, zewaca bi zorê, sinetkirina jinan, recm..... û h.w.d, lê em karin bêjin ku ew hemû tên ser yek wateyê, ew jî bikaranîna hêza govdeyî, aborî û derûnî li dijî jinê û çandeke ku mafê wekheviya jin û mêran mikûr nîne û rê li pêş bindestkirina jinê vedike. Belê, îro di sedsala bîst û yekê de jî, hîn li gelek welatan jin di warê raman, vîn û fizîkî de rastî zordarî û destdirêjiyê tê, di bin navê adet û baweriyên kevnar û asayê de, li ser wê hîn pîvanên paşverû tên ferzkirin. Eger em bûyerên kuştinê "wek nimûne" bişopînin, emê bibînin ku mêr ji aliyê kesên biyanî ve tên kuştin, lê di heman demê de jin ji aliyê hevjînê xwe yan bav û birayê wê ve tê kuştin. Li ser erdnîgariyeke gelek fireh, ji Efrîqya ta Kurdistanê, her roj bi dehan jin jiyana xwe bi dawî dikin, an tên kuştin.. çima?!!!!

Bêguman gelek sedemên wê yên curbecur hene, lê di rastiyê de ew tev ji kaniyeke dîrokî dertên, ew jî civaka nêremejî ya ku mêr serweriya wê dikin û piraniya cîhanê pê tê rêvebirin. Di hemû serdemên dîrokî de yên ku mêran aborî û serwerî xistine destên xwe, destlatdarî û zordarî li ser jinê hatine kirin. Ji ber ku di serdema neyolîtîk de, dema mêr li çol û çiyan nêçîrvanî dikir, jinê tov li ser erdê diçandin û aborî dida afirandin, û bi wê civaka mirovahiyê bû xwedî hêz.

Ji ber girîngiya rola jinê di jiyana mirovahiyê de, di pir serdemên dîrokî de jin wek xwedêwendan hatin binavkirin, û li ber pûtên wan nimêj dihate kirin.Piştre mêr xwest serûberê rêveberiyê bi dest xwe xîne, û herwisa civakeke nêremejî ava bike, û dema gihîşte wê armancê wî dest bi zordarî û bindestkirina jinê kir.

Ma gelo civakek bi vî mejî, wê çawa bi dadmendî, demokratî û awayekî durust li mafê jinan mêze bike?!!

Eger em bixwezibin pêşketin û şaristaniyê bistînin, divê berî her tiştî em mejiyê xwe ji hemû ezîtiya nêremejîtiyê bişon û jiyana mirovahiyê bi gulên azadiyê bixemlînin, ta jin û mêr bi hev re jiyaneke azad parve bikin û bijîn.

Welatek Daleqandî

Malva Elî

Li ser sînga welatek bi darê xaçê ve daleqandî, ji bilî mîxan tu pêwîstiya me bi çîrokên evînadaran nîne, bi şûrê bendan dilên parçekirî, tenê çemê penaberiyê serxweş û mest dike û nizane ber bi kûve diherike. Feraşîneke Bê sênce, lê dewsa rûberek westyayî li hêviya ku bîranîn bilivin an jî hêvî tîr bibin xwiya dike, û dara omêdan, di sînga feraşînê de sitû xware. Derîzanka avahiya me wê çaxê behsa êşên xwe nedikir belkî derfet peyda nedibû ku êş û azarên xwe bi min re parve bike, an jî belkî pora min a sipî bala derîzanê nedkişand û nedizanî ku ez dikarim hinek xem û êşan hilgirim. Janên tilyan, çîrokên xwedanê êşên nûjen, ji hinavê salan dinoşin, û di nav mist û kulmên serxweş de, daxan li şona xwe jibîr dikin, dax dimînin nîşanên wefadariyê, bi vîna, xwe ragirtinê, li hember pêl û gerên hov , di kendavên bê kevî de. jan û êşên bi salan di çelteyê bîranînan de veşartî, li derdora avahiyan, belav dibin, Weke keriyek pez di zeviyekî de, belav bibe, êdî dê di bexçeyan de tenê aşêfa janan dikin û bav bi zivistana dilê xwe, jenîna xewnên ji bîrkirî, li ser derîzanan, bi tilyên êşê, lêvên birînan gez diken. çavên şil, ji riya vegerê, hewildidin ku bi bîranînan, dil mijol bike, dema ku temenê wî 19 de salî bû, û berî bibe jimarek di nav karwnên penaberan de, di kûrahiya bîranînan de rastî gelek wêneyên raxistî li ser rûberê feraşînê hat weke kulîlkên nû bişkûvî . ji nalînên hejaran, ber bi keserên tenîtiyê, meşka azaran me di hinavê xwe de dikeyîne. Giyan weke deryayekî sawêrên kevnar e di bin baskên xwe de dilorîne, lê min dizanî ku hestên ji bîrkirî û kesên kilîta dil bi sitûna kon ve daleqandî, dê min ber bixwe ve bikşîninin ta peymana mayînê bi min re imze bikin. daxên rêwitiyê, kezba dayik û bavan di sotînin, rondik li rexên çavan di êwirin Hemî alav weke xwe dimînin û diçurisîn weke ku cil û bergê cejnê bin û ez jî li ser tehtek bilind û dûr matmay me. rikberiyê bi êşan re dikşînim, na herikim, Ew derîzan û ew avahî ya ku xwidê giravî digotin ew mala we ye, me li paş xwe hêlişt, û em ber bi jor ve çûn, ta bi rojê re, bi tenêtiya xwe bijîn, ew roja ku kirasê şevê li xwe kiribû, ji zelaliya çavê wê wesa xwiya dikir di gera bê dengiyê de kezeb parçe parçe dikir. Roja ku bîranînên kevnare bi bîra me tanî û zelalî û dil germiya rojê ji me re digot: ez hêvî û omêdên we me heger hûn bixwazin bi min re şanaz bin û ji kesên dûr û ji bîrkirî re bistirin, û peyzok serpêhatiyên xwe ji nifşê binav buyî re birêsin. Tevlî ku dewsa nexşeyên janan, û şopa rondikên daleqandî li ser rûdêmên bi agirê heskirina axê sotiyayîn diyare, hêvî xwe di nav bijonaya mêrgan de di şêlênên, nalîna dengê zeviyan, nîşana wêraniya keriyên rêwiya ye, êdî tenê konê şînê vegirtî maye û kirasê reş, xwe li hemî dilan pêçaye ," kundo" jî qoçên xwe vedane, kêlî bi kêlî rûberê avahiya xwe firehtir dike, û bîna hemî kavil û çavkaniyan di çeltê dilsozan de, bizava li hevatina, çavên vegerê û xewnên nîv cû dike, çavên rojê bi perdeyan di nuxumîne.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

Eliyê Teremaxî... Rûpelek Ronîdayî Ji Dîroka Toreya Kurdî

Min Dê Ilim û Kelamê Mewzûn
Alî Bikira Li Banê Gerdûn
Bînave Riha Melê Cizîrî
Pê Hey Bikira Elî Herîrî
Keyfek Wê Bida Feqîhê Teyran
Hetta Bi Ebed Bimaye Heyra

Mihemed Şêxo

Dibe ku lerzîn û alozî nektibe vekolîna kurdî weke ketiyê dema xwestibû Kelepûra Kurdan jevwejêre û hin nav jê re bûne pirsgirêkên mezin ji wan navan ku xwedan dan û westane xwedan dan û behane, ew jî Eliyê Teremaxî ye . Ev yek dibe vedgere du sedeman. Yek ku temenê vekolînê ne ji zû de dest pê bûye. Dido ne paldana vekolînê li ser jêderên sereke. van herdû sedeman hişt ku şaşî dubare bibin û kûr bibin. ji ber vê yekê xwesteka hemî nivîsoka ew bû di hember limêjgeha wî de serê xwe xûz bikin. ku ew halo dane nasîn ew helbestvanê yekemîn e!!ew bexşannivîsê yekemîn e, ew rêzimannivîsê yekemîn e . Gelek nêrînên cuda derbarî wî de derketin ...hinan got navê wî Teremokî ye... hinin dî digotin Teremaxî.... wiha navê gundê wî jî dihate guherîn mîna wan navan. Ne wilo tenê ew gund li kû ye li Mekse yan li Wanê ye ....yan li deverin dî ye....jidayîkbûna wî jî problemek çêkiriye. Hinan ew vegerandiye hezarê koçî û hinin dî ew di hezarê zayînî de nivîsîne. hin dibêjin ku ew helbestvanekî hêja ye... helbestên wî birêkûpêk in... hinin dî dibêjin na Elî ev helbest ne nivîsîne. Û Elî bixwe tinneye...hineka ev helbest nivîsîne û li ser navê wî belav kirine.. gelo qey ew tenê rêzimanzan bû...û bi tenê wî rêzanên Erebî bi kurdî nivîsîne.....yan wî rola ziman zanîbû û di rêzimana kurdî de jî xebitye. Gelo çilo em ê behwer bikin ku pişti ew li gelek bajar, herêm û komaran geriyaye ...ta nav û deng pê ketiye ..rêzimana yekemîn nivîsiye...û hin sernamên helbestan danîne lê ti helbest nenivîsîne....yan ev helbestên wî yên Eliyê Herîrî ne...wek hin dibêjin !!!!

Di xêzên bê de em ê li gor karînên xwe li dûv van pirsan herin, dibe rastî ji me ve belû bibe...hember pirbûna van nêrînên tevlûhev..çi şaş çi qels û lawaz. Em bi hêvî ne ku wê hin ronîkirin ji mijarê re çêbibe û wê gelek pirsyarên giranbuha bêne afirandin da ew karibe hinek ji mafê Teremaxî bidêyê û navê wî bi tîpên zêrîn binvîse.

Nav..

Ebidireqîb Yusiv di pirtûka xwe de dibêje..Mele Hisên tiromaxî tesrîfa kurmancî nivîsiye . ew zana û mamostayekî mezin e .ji bajarê Meksê ye . gora wî li goristana Mîr Behdîn e .hin kesên wê deverê ev ji min re gotine lê dibe danerê pirtûkê Mele Eliyê Teromaxî be ne Mele Hisên be. Wiha ew şaşiya ku di pirtûka xwe de ya bi navê Elelam min Meşahîr Kurdistan .serrast kiriye .

Teremaxî...

Weke hatiye nasîn torevanê me bi navê gundê xwe hatiye nas kirin, ew gund Teremax e. ji bo wî jî E. Yûsiv dibêje...Teremax gundekî biçûk e dused mal e. Dikeve Rojavayî Meksê, nêzî Hezanê bin çiyayê Nan Kas. Eladdîn Alsicadî jî dibêje.. Eliyê Termokî ji kesên Hekarya ye. dibêjin di sedsaliya dehan de jiyabû.

Lê di pirtûka " Xulaset Tarîx Alkurd" we Kurdistan de hatiye ku ..Eliyê Termaxî ji gundê Termok e..yê dikeve navbera Mako û hekariya de .

Xwedanê pirtûka Eliyê Teremaxî dibêje...hin zanayên herêma Hekarya dibêjin ku gundek bi navê Termok jî heye û ew ne Teremax e .

Dr. Belec Şêrgo yekemîn kesê di sala 1930 î li ser nivîsî dibêje ew Eliyê termokî ye!! em dibêjin sedemê vê şaşiyê ew e ku dema Aliksender Jaba destnivîsa Teremaxî bi Firansizî çap kir ew kire pilana şaşiyê ji herû tîpên ku ji dêla "X" yê ve tên nivîsîn ew jî "K" û "H" ne. Lê ku em vegerin jêderê sereke, jêderê hemmiyan destnivîsa Mele Mehmûdê Bayezîdî ji destnivîsa Teremaxî re wî nivîsiye, di dîroka hezarî de li derdora Hekarî û herêma Meksê li gundekî bi navê Teremax zilamek bi navê Elî derketiye yekî jîr têgihiştî û zana bû.

Mînorskî di Daîret Almarif Alislamiye de dibêje: Elî ji kesên Teremaxê ye .

Jidayîkbûna Wî:

Belec Şêrgo sala hezarê koçî kiriye sala hezarê zayîna wî. Lê Marûf Xeznedar dibêje ku ew dîrok ya pirtûka wî " Elserf Elerebî Billuxe Elkurdîye" ye . Piştî Belec Şêrgo bi heft salan Kamîran A Bedirxan û Lûsî Pol Margirêt zayîna wî kirin hezarê zayînî. Lê gelek êrîş hatin wan yek ji wan Izzedîn Mistefa Resûl e. Ew jî şaş dibe û navê wî Tirmahî dinvîse û zayîna wî sedsaliya yazdehan de dinvîse . Paldana wî jî li ser nameyeke ku ji Xeznedar jê re hatibû, dema wî li rûsya yê dixwend, ne wilo tenê jî ew li ser Bedirxan dibêje ..xuya ye ku Bedirxan ew kiriye hezarê zayînî de ji bo tiştekî nepenî .ji gotinên I M Resûl xuya ye ku wî tiştek li ser destnivîsa Teremaxî nizanî bû . û ev yek yekî matmayî dihêle ji ber Xeznedar dibêje ku tiştên Resûl gotine ne duris tin. tevlû ku paldana wî li ser nameya Xeznedar bixwe ye. li ser Belec Şêrgo jî Xeznedar dibêje ku ew derbarî jidayîkbûna Teremaxî ew şaş e. lê piştî çar rûpelan ew gotinek vajî vê dibêje ..Teremaxî pirtûka xwe di hezarê koçî de daniye û gelek jêderên rastgo ji vî tiştî re hene weke Jaba..Mînorskî..B. Şêrgo.. Elî Sîdo Goranî ..Mihemed Merdûx Kurdistanî .

Helbestên Wî

Dr. Kemal Marûf Dibêje: Tevlû wê xurtbûna helbesvanê xwîngerm Elî Altermekî ta van rojan, lê vekolîn di mijarê de mirhov dighîne wê biryarê ku ev helbestvan bi xwe nîne. çimkî Ehmedê Xanî di dastana xweyî navdar de navê hemî helbestvanên berî xwe gotiye, lê navê wî negotiye!!

Min dê ilim û kelamê mewzûn
Alî bikira li banê gerdûn
Bînave riha Melê Cizîrî
Pê hey bikira Elî Herîrî
Keyfek wê bida Feqîhê Teyran
Hetta bi ebed bimaye heyra

Hacî Qadir Koyî jî, di helbesteke xwe de, ew jî, bi navê Şehsiwarî Belaxetî Kurdan navê bîst û pênc helbestvanan çêl dike, lê navê Teremaxî nenivîsiye!!

Izzeddîn Mistefa Resûl berî Kemal Marûf ev yek gotibû, ji ber Marûf mendelkirina Teremaxî ji cem Resûl biribû. Lê mixabin wî navê wî di nav jêderan de ne daniye!!!

Tunnekirina helbestvan Eliyê Teremaxî li cem Marûf Xeznedar dibe bûyerek teqez ji ber van egeran..

1-Nexuyakirina têkistên Kurdî yên helbestên Teremaxî .

2 -Navê wî di destnivîsên kevn de nehatiye.

3- Ehmedê Xanî û Hacî Qadir Koyî ew çêl nekirine.

4-Lûsî Pol Margirêt û Kamîran Alî Bedirxan Teremaxî weke helbesvanê Firansizî Ronswar dîtine. Ango, çawa van herdû daneran helbestvanek ji sedsaliya dehan weke helbestvanekî ji sedsaliya şazdehan dîtine?!!!

5 - Asta pêşveçûna aborî û konevanî di van helbestan de ne li gor pûşveçûna gelê kurd e, di sedsaliya dehan de.

6 - Giyanê toreyî nû ye, li gor toreya Eurupî ya kilasîk e.

Dibe herdiwan (Lûsî û Kamîran) bi helbestan lîstibin, yan ji helbestên Ronsiwar hin wêne biribin û bi zimanê Firansizî bi navê Teremaxî belav kiribin, weke ku ji zimanê Kurdî ew helbest wergerandine.

Prf Xeznedar wek vekolînerê zanistî di beşê Kurdî de li Instutiya Lênîngiradê de bû, derfet jê re hebû ku bighêje têkistên Teremaxî, Lê dibe ku ne hertiştê Bayezîdî dabên Jaba bimîne dîlê pirtûkxana Saltkofê!! weke bê çawa Jaba pirtûka Bayezîdî (Cami; Risaleyan û Hikayetan bi zimanê Kurmancî) bi herdû zimana Kurdî û Firansizî belav kiribû.

Jaba ji bo belavkirina helbestên Teremaxî dibe jêderê yekemîn. Çimkî Xeznadar û Resûl bi xwe dibêjin ku (Lûsî û Bedirxan) navê helbestan ji Jaba birine û ew helbest di sala 1937 an de belav kirine.

Vêce, ev rêveçûna vê bûyera dîrokî bi vî awayî çêbûye: (jêderê yekemîn) Bayezîdî(1857) =====gelek têkist=====Jaba (1886)====navê helbestan , tiştin dî jî======Lûsî û Bedirxan (1937) ====helbestên Teremaxî ====Xeznedar(1961)====dûdilî û mandela ===I M Resûl (1963)===veguhestina tîp bi tîp====K Marûf (1990) .

Ev rêveçûn çi ji me re dide xuyakirin:

1 - Kemal Marûf tu agahî ji tu kesî nebirine, ji bilî M Resûl pê ve, û tu jêderên dî çêl nekirine.

2 – M Resûl vajî jêderê xwe dibe (xeznedar) dema ku dibêje (Rodîngo , ji bo helbestên Teremaxî tiştek neaniye). Lê Xeznedar dibêje: Rodîngo agahiyên xwe ji pirtûka "Xulaset Tarîx Elkurd We Kurdistan" û pirtûka Lûsî û Bedirxan biriye.

Xeznedar dibêje ku Jaba navê helbestan dane Lûsî û Bedirxan(Mextûtat Ferîde We Metbûat Nadire). û di pirtûka (Elwaqîye Fî Eledeb Elkurdî)ya I. M. Resûl.

Prf. Qenatê Kurdo navên van helbestan di pirtûka xwe de "Tarîxa Edebyeta Kurdî" de nivîsîns ew jî ev in:

(Qewlê Yekane = Kelime Wahîde) – (Morya Yaqût = Xerez Elyaqût)-(Kurên Weten = ebnailweten) - (Jiyana Heqîqet Xewn e =Elheyat Elheqîqîye Hulum).

Mamoste Reşîd Findî piştî lêgerînek kûr bi nêrînek taybet dibêje: ev helbest dibe yên Eliyê Herîrî bin, ji ber du egeran: yek: Hin vekolîner Herîrî vedgerînin (1009)zayînî.

Dido: Peyva Perîzada ya di helbestên Teremaxî de, nêzî peyva Perîxan e, hezkera Herîrî.

Û herwekî em dizanin ku helbestvanan navên hezkerên xwe diguhertin, vêce ne dûr e ku bi şaşî navê Herîrî û hezkera wî çûbe ji Teremaxî û hezkera wî re!!!

Ew jî ji ber van herdû malikan:

Perîzada tu wa hatî li ser çavên di min şala
Melew zanî tu wa hatî ji dengê tewq û xirxala.

Dr.kamil Hesen Elbusêr di pirtûka xwe de ya bi navê(Kamîran Şair Kurdistan) dibêje: Wê Teremaxî bibe xwedan dibistaneke toreya netewî di nav gelê xwe de.

Hin in dî jî dibêjin ku destnivîsên Teremaxî winda bûn, yan di talankirina Berlînê de şewitîn, ji wan Tomas Buwa di pirtûka (Merifet Elekrad) de.

Rêzimana wî:

Eger Mayrîzo Karazonî yekemîn rojhilatnas be yê di rêzimana Kurdî de xebitî be, sala 1787 an, û di pey re S'îd Sidqî Kaban, yê pirtûka xwe (Muxtser Elserf We Elnehû Elkurdî)sala 1928 an belav kiribû,Teremaxî berî wan bi gelekî rola rêzimanê zanîbû, lewma, dema wî şagirtên xwe fêrî rêzimana Erebî dikirin, wî fêrkirina zimanê Kurdî giringtir didît û di mijarên wê yî rêzimanî de melevanî dikir, ew dibêje:

توجد في اللغة الكردية خمس صيغ للحاضرلاغير نحو:

Diçin, diçim, diçin, diçe, diçî û rêpîvan halo ye....

me, em, ewan, : اما الضمائر الستة التالية
hûn, ew, tu فإنها تستعمل مع الافعال و

يوجد بحث في الحاضر المنجز بحرف الباء b الذي في أول الفعل وهو دلالة الامر و له خمس صيغ نحو :

Bide للمفرد المخاطب للمذكر و المؤنث
Bidit للمفرد الغائب
Bidin للتثنية و الجمع الغائب
Bidim للمفرد المتكلم
Bidin للجمع المتكلم

Mijarên din di pirtûka wî de ev in :
المصدر اسم الفاعل اسم المفعول النهي الغياب و ضمائره و ضمائر الحاضر و الاسم وأسماء الاشارة والنداء والاستفهام والمضاف والمضاف إليه والنسبة.

Ev pirtûka Teremaxî Prf.Xeznedar di bin vî sernavî de çapkiriye:
الصرف العربي باللغة الكردية

Lê zanyarê hêja M Bayezîdî yê ku bi nivîsoka xweyî zêrîn ew nivîsî bû ev herdû hevok yan sername jê re danîbûn:

هذه عبارة علي الترماخي .....هذا كتاب صرف اللسان الكردي

Jaba jî li ser qapa wê ya wî ew bi Firansizî çapkiribû ev nivîsiye:
Grammaire Kurde par Ali Termakhi

Bi nêrîna me gereke Xeznedar êrîşî ti kesî nekiriba. ji ber ev karê Teremaxî destpêk bû, û eger ew ne tekûz be, lê wî gava yekemîn avêtibû, û ji ber vê yekê jî, em dibînin ku Bayezîdî rast nivîsiye li ser destnivîsê.

Wiha, em gihane dawiya mijarê, lê ka em vê pêşgotina Teremaxî ya ji pirtûka xwe re nivîsiye bixwînin, da em zanibin bê çiqas ew xwedî hestekî dilsoz e, bo şagirt û milletê xwe.

(llem tu bizan, ey mufredê muzkerê, muxatib, ku ji bo yî taîfeyê Ekradan re jî lazime ku bi zimanê kurmancî ew jî ilmê serfê bi zanin....ev ilmê serfê di hemû kafeyêd lîsanan de heye û îcra dibe, emma ê ku niha ji boyî me lazime, zimanê Kurmanci ye)

Bayezîdî ...1797 =1859 z

Teremaxî.... =1656 z

Xwedê wan bi dilovaniya xwe şa bike, û wan bixe buhişta rengîn de.



Kurdî Xweshe

Neheng	تمساح، حوت
Nankor	ناكر الجميل ،خائن
Mandel	إنكار، رفض
Kam	رغبة
Bêjî	ابن حرام
Kal	غمد
Berdar	وافر، خصب
Nevî	حفيد
Qerf	مزحة
Laqirdî	مزحة

Li ser rêya Ewropayê hev nas kirin, li kampê zewicîn

Koçberekî ji Rojavayê Kurdistanê û koçberekî ji bajarê Humsê yê Sûriyeyê li Sirbistanê hev nas kirin li Almanyayê zewicîn û daweta xwe kirin.

Hesenji Rojavayê Kurdistanê ye, Îlham ji Humsê ye. Herdu ji ber şerê li Sûriyê reviyan û berê xwe dan Ewropayê. Li Sirbistanê wan hevdu nas kir, van rojan li kampeke koçberan a li Almanyayê daweta wan hat çêkirin; koçberên din mêvan û hogirên wan bûn.

Hesenê 38 salî derbarê zewica xwe de wiha got: "Şahî gellekî bi dilê min e û ez gellekî spasdar im ku ev derfet ji me re çêbû ku em bikaribin li vir daweta xwe eşkere bikin. Ez hêvî dikim ku ez bikaribim ligel hevjîn û malbata xwe di aştiyê de li Almanyayê bijîm"

Di lidarxistina şahiyê de, Mizgîn Kizilyel bû arîkar. Mizgîn karmendê kampa penaberan ya Scheuen li bakurê Almanyayê ye.

Mizgîn Mizgîn Kizilyel jî wiha got: "Diviyabû em gellek tiştan îdare bikin. Normalî bûk bi hespekê ji mala wê tê derxistin û zilam jî li ser banê mala xwe li benda bûkê ye, lê li vir me nedikarî vê yekê bikin."

Herdu hunermendên kurd Ednan Horo û Hêvî Yûsif jî li heman kampê koçber in û bo rojekê jî be, ew vegeriyan rojên xwe yên berê û bi deng û tembûra xwe daweta Hesen û Îlham geş kirin..rûdaw



Ji bo derhênerê Kurd 6 salên girtîgehê

Hat ragehandin ku li welatê Îranê di dadgeha destpêkê de ji bo derhênerê Kurd, Keywan kerîmî 6 salên girtîgehê hatine birîn.

Biryar ji aliyê Liqa 28 a Dadgeha Înqilabê bi serokatiya Qazî Meqîse bo Kerîmî hatiye diyar kirin. Kerîmî bi "propagandeya li dijî Komara îslamî ya Îranê" û "Bêrêziya bi pîroziyan" hatiye tawanbar kirin.

Kerîmî ku xelkê Rojhilatê Kurdistanê ye di sala 2013'ê de jî ji ber filmê "Nivîsandina ser bajêr" hatibû binçav kirin û piştre bi danîna rehîneyê hatibû berdan.

Belge filma "Nivîsandina ser bajêr" berhema dawî ya wî derhênerê Kurd e, ku dîroka dîwar nivîsîn û Grafittî ya siyasî û civakiyên piştî şoreşa gelên Îranê nîşan dide.

Herwiha belge filma navbirî ya bi navê "sînorê Şikestî" ku behsa jiyan û zehmetiyên karê Kolberên Kurd vedibêje, heya niha di 11 festîvalên navnetewî de xelat bidest xistine.

ev film hê li Îranê nehatiye weşandin.

"Jiyana hevjînan" navê filmekê din yê Kerîmî ye ku sala borî di Festîvala Surrealidades a Colombia yê de xelata başt în filmê festîvalê bi dest xist.

Evîn « Di Pendên Kurdî De »

Bi darê zorê hizkirin nakeve torê
Dilgirtî dunya girtî
Jiyana bê dil weke baxê bê gul
Ê xwedî yar be gula geş e ,ê bê yar be kerê reş e.
Hizkirina ji dil, barekî giran e li ser mil
Bela dilê me ji dil be, bela tûrikê parsê li mil be
Derdê dila derdekî no ye , ne bi şev e ne bi ro ye

Zûbêjjj

Heska Mala Hekşa Xweş Heske

Mamik???

Bîr cawîne — Avê di seqîne
Dewl darîne — Ew çiye ?
Kevir dikşîne

Bersiva hejmara 27an: Dasa Genim

Xaçerêz

ASOYÎ

1.Siyasetmedar û zimanzanekî kurd.
2.Ji cilan, wekhev.
3.Kul û êş.
4.Ji armancên şoreşan (vajî), Wekhev.
5.Nêta baş, îlon (belawela).
6.Wekhev, alaveke pîvana geniman.
7.Ji aliyan (vajî).
8.Taxeke kurdên Şamê.

STÛNÎ

1.Dilnexwazê cengê.
2.Sûnd, cinawir.
3.Bi olê pabend e, agir.
4.Cînava kesê yekê, zeviya bi avdanê çêdibe(vajî).
5.Zaravekî Kurdî, Vexwarina sereke.
6.Lawir (vajî).
7.Wekhev, ji kalikên Kurdan.
8.Ji bo bersivdanê ye, Hewlêr.

	1	2	3	4	5	6	7	8
1								
2				■		■		
3		■					■	■
4						■		
5				■				
6			■		■			
7		■						
8							■	

Hejmara bûrî

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	T	E	R	E	M	A	X	Î
2	E	W	R	■	A	V	I	S
3	V	■	R	E	D	■	Z	O
4	G	G	■	F	E	R	A	T
5	E	■	Y	A	S	Î	N	■
6	R	R	■	R	■	H	Î	M
7	■	E	R	E	B	E	■	E
8	Ê	V	A	■	Û	M	E	H